

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

91
2024

bîrnebûn





Tidskriften utkommer 3 nummer per år.
Çar mehan carekê derdikeve.
Utges av Apec Förlag AB
hejmar 91/ 2024
Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Editor: Ali Çiftçi, Heciyê Gulê, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê:
Ali Çiftçi, Hızır Akbina, Mem Xelîkan, Dr Mikailî, Muzaffer Özgür,
Xoyretinê Mihemmedî Seid, Têmurê Xelil, Bêrivan Keskin,
Seyfî Doğan, Adem Özgür, Ahmed Barbar, Prof. Dr. Hacı Akman
Hemo Celkan, Mehtab Îdelî, Xizan Şîlan, Rojvan Enes, Bilal Celepli,

Belavkirin / Distribution:
Ewropa: Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanyayê
Tfn: 0049-172 298 24 51

Numra kontoya li Swêdê:
(Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê
APEC, "Bîrnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden
BIC/SWIFT: DABASESX
IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874
Çap / Baski: Apec-Tricky AB

Biha/Pris:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 30 TL
Abone ji bo du salan
Swêd: 400 SEK -Almanya 50 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Medya Kitapevî
Bekar Sokak No: 7, Giriş kat.
Beyoğlu / İstanbul / Türkiye

Adress
Navnîşana li Swêdê
Apec
Mjölmarstigen 1
SE 163 41 Spånga/Sverige
E-post: info@apectryck.se
Internet: www.birnebun.eu

Her nivîskar bersive nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tîr,
sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan
nayên vegeandin. Ji ber stîl û devokên taybet em
dest nadin hinek nivîsên nivîskarên xwe.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Zîman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

bîrnebûn 91/2024

91 2024

Wênayê berg: Xanê û Elik ji Simikan,
Kadinhani-Konya ji arşiva Yalçın Çiftçi

Naverok

Ji bîrnebûnê	4	Alî Çiftçi
Kursa îmtîhana unîversîteyê li Swêdê	6	Xoyretinê Mihemmedî Seîd
Şeva Mala Çandê ya Kelhasan li Danîmarkê	8	Alî Çiftçi
Bûyerên balkêş ji jiyana êzdiyan	13	Têmurê Xelil
Kilamên me, Şîna Bektêş	16	Mem Xelikan
Materyal û berê	19	Prof. Heci Akman
Dayika strana Êma Hemê-II	23	Hızır Akbîna
Di parastina nasnameya Kurdên Anatolîya Navîn de rola çandê	28	Mehtap Îdelî
Rojnivîsk 2 - Kawil	32	Bêrivan Keskîn
Dayik	34	Ahmad Barbar
Rojnivîska lambeya trafîkê	36	Rojvan Enes
Ocaxî Malê Bello	39	Dr. Mikailî
Helbest	42	Seyfî Doğan
Hewik çê dikeve ser	43	Hemo Celikan
Hevpeyvînek bi Burhan Sönmez re	49	Adem Özgür
Jîyana li serê min	55	Bilal Celebli
Gera ber bi welêt ve	59	Alî Çiftçi
Qerfo û Quto	61	Seyfî Doğan
Qêrînên xeyalên pûç	62	Xizan Şilan
Bayê xerîb	60	Adem Özgür
Dîroka hunera tevnê, xalî û kurd -I	67	Muzaffer Özgür
Bi Meryem Barlasê re hevpeyvînek	74	Stiftelsen KAN
Intervjun med Meryem Barlas	77	Stiftelsen KAN
Peykerê bi serê xwe	80	Siya Jandar
Keça kurda	81	Siphîye Bulut
Dengê bêdewletîya min - I	82	Xoyretinê Mihemmedî Seîd

Ji Bîrnebûnê

Ev hejmara di dawîya 2024an de derdikeve. Her ku em ber bi dawîya salê ve tên li welêt û seranserê cihanê însan li benda hêvîyên nû dibin. Hêvîya ku ev şerên hene bi dawî bîn, aştî û aramîyek bê da ku metirsîyên li nav însanan peyda bûne ji holê rabin.

Ji 2019an vir ve em dibînin pir bûyerên mezin wek şerên bêhempa ku însan ne li bendê bûn, tofanên mezin yên xwezayî û herwekî van bûyerên ku tesîra xwe li hemû cihanê dikan, ev çar pênc salên dawî naveroka medya cihanî dagirtîne. Mixabin ev bandoreka mezin li ser rewşa me kurdan jî dike. Ev destkevtîyên ku bi taybetî li hinek deverên welatê me, Başûr û Rojava hêvîyên mezin li ba kurdan peyda kiribûn, bi van şerên dawî, Rusya û Ukraniya, Îsrail û Hamas rewşa kurdan li cihanê wek berê di rojeva cihanê de cîh negirt.

Li welêt jî dîsan dest bi qeyûman hatîye kirin. Li hinek şaredariyên ku kurd hatibûn hilbijartin ji alîyê dewletê ve bi zorê dest dan ser. Di şûna wan de qeyûm hatine tayîn kirin. Ev şaredarên ku bi raya xelkê hatibûn hilbijartin jî hatine girtin. Di alîyekê de dewlet erîş dibe ser

kurdan, di alîyekî din de jî behsa prosesa ‘lihevhatinê’ dikan!...

Guhertina avhewayê li herêma Anatoliya Navîn bandoreka mezin kirîye. Germahî li gor normên demsalî pir zêdetir bûye, barana salane em dibînin ku ketiye binê normalê. Di vê çarçoveyê de bi ziwabûna li herêmê çend pirsgrîkên girîng di van salên dawî de derketine holê, wek kêmbûna hatinên ji berhemên çandinîyê û zêdebûna bihayên xwarinê. Wendabûna veguherînên demsalê yanê çar demsal êdî wek berê nayên dîtîn. Erozyon û windabûna axê. Ji ber kêmbûna hatina ji çandinîyê û bêkarî nifûsa gundan koçî bajarên dike. Piraniya gundên Anatoliya Navîn gundên kurdan in. Dema koçberîya ji gundan berbi bajarên mezin û welatên Ewropayê ve zêde dibe, ev gundana vala dibin û asîmîlasyon jî em dibînin ku zêdetir dibe.

Di vê hejmarê de li ser kursa ku berî sê salan Waqîfa Kurdên Anatoliya Navîn, *Stiftelsen-KANê* li Stockholmê, li dibistana şemîyê dest pê kiribû bi navê *Kursa îmtihana universîteyê li Swêdê* birêz Xoyretînî Mihemmedî Seîd danasîneka kurt kirîye. *Stiftelsen-KANê* yek ji xwendekara ku li vê

kursê xwendibû, Meryem Barlasê re hepeyvînek ji ji bo vê hejmarê kirîye. Hûn ê di vê hevpeyvînê de serkeftin û dilşahiya Meryemê bixwînin.

Kurdên Anatoliya Navîn ji 1964an ve derketibûn welatên Ewropayê, ji destpêkê piraniya yên ji gundê Kelhasan ji hatibûn Danîmarkayê û piştî demekê ji pêwîstiya wan çêbû ku xwe bi rêxistinî bikin. Her gundekî ji xwe re bi navê “Fona Cenaze” komele ava kirin, ji bo ku cenazeyên xwe bibin li gundê xwe binax bikin. Niha pêwîstiya xebatên din ên çandî ji bo malbat, zarok, ciwan û salmezinan re lazim in. Ji ber vê gundiyan kelhesenî ji li Danîmarkayê berî bi du salan navê komelê û destûra xwe guhartine û ji bo avahîyeka Mala Çandê ya Kelhasan li Danîmarkeyê ava bikin, dest bi xebatan kirine. Bi sernivîsa *Şeva Komela Mala Çandê ya Kelhasan li Danîmarkê* ev karûbarê ku dane ber xwe hatiye nasandin.

Têymûrê Xelîl bi sernivîsa *Bûyerên balkêş ji jîyana êzdiyan* hinek aliyên çanda êzdiyatîyê bi me dida nasîn.

Mem Xelîkan bi zîncîrenivîsa xwe ya *Klamên me, Şîna Bektêş* nivisîye.

Prof. Dr. Hacı Akman bi sernivîsa *Materyal û berê* etnîsîteya çanda materyal ji bo afirandina ci-vakek bi “bîra” hevpar ku tiştek li ser “em” kî ne vedibêje, lêkolaye.

Hizir Akbîna *Dayîka strana, Êma Hemê -II* strana wê ya li ser Gordo gotîye û serpêhatîya Gordo ji nivisîye.

Mehtap Îdeliyê *Di parastina nas-nameya Kurdên Anatoliya Navîn de rola çandê*, Bêrivan Keskînê *Kavil*, Ahmad Barbar helbestek bi navê *Dayik*, Rojvan Enes *Rojnivîska lam-beya trafîkê*, Dr. Mikailî *Ocaxî Malê Bello*, gundê *Ruta Gazê*, nivisîne.

Hemo Celikan “*Hewik çê dikeve ser*” ji berhemên xwe çendekan bi me dida nasîn.

Burhan Sönmez niviskarekî ji gundê Şêxan yê Heymanayê ye. Sönmez bi dehan roma nivisîne û serokê Pen a navnetewîyê ye. Adem Özgür bi sernivîsa “*Ez vedigerim malê xwe*” bi hevpeyvînekî bi me dide naskikrin.

Bilal Celeplî bi sernivîsa *Jîyana li ser serê min* li ser kofiyê, Seyfî Doğan bi sernivîsên *qerfo*, *quto* û *helbest* haiku û *helbest*, Xizan Şîlan wek caran *helbestek* bi sernavê *Qêrîna xeyalên pûç*, Muzaffer Özgür *Di diroka hunera tevnê*, *xali û kurd* bi lêkolînekê û Xoyretînê Mihemmedî *Seîd Dengê bêdewletîya min-1* ev hejmara dagirtine.

Hêvîya me ev e ku em ê bi hev re bi aramî û aştiyê bikevin sala 2025an. Ji niha ve sersala teze li we gîştikan pîroz be!

Ali Çiftçi

Kursa îmtîhana unîversîteyê li Swêdê

Xoyretînê Mihemmedî Seîd

Waqifa KAN (Kurdên Anatolîya Navîn) nêzîka sê sal in li Swêdê, li bajarê Stockholmê û li şaredarîya Botkyrkayê kursa îmtîhana unîversîteyê, bi swêdî *Högskoleprov* dide. Beşdarên kursê bi piranî kurdên li lîseyê dixwînin ku navbera 16-20 salî ne.

Li Swêdê yan bi rêya îmtîhanê yan jî bi rêya notên xwe yên lîseyê xwendekar dikarin bikevin unîversîteyê.

Piranîya xwendekaran jî kurdên Anatolîya Navîn in. Piranîya jî xwendekarên kurd keçik in. Xwendekarên ereb, azêrî û sûryanî jî he ne. Yek xwendekar jî ji Srî Lankayê ye. Niha nêzikî 35 xwendekar kursê digrin. Her hefte roja çarşêma û şemiyê 2-3 saetan ders digrin.

Mamosteyên kursê dudu ne. Hayrettin Guven û Halil Uluşeker. Her du mamoste jî ji gundên Konyayê ne. Hayrettîn Guven wek doxtor û lekolîner li Enstîtûya Karolinska, Halil Uluşeker li

zanîngeha teknîkî ya kralîyetê, KTH (*Kungliga Tekniska Högskolan*) xwendekar e.

Kurs bi alîkarîya şaredarîya Botkyrkayê û ABFê tê dayîn.

Kursa îmtîhana unîversîtê bi sê beşan te dayîn; matematîk, swêdî û îngîlîzî.

Li Swêdê îmtîhana unîversîteyê salê du caran dibe. Li îmtîhana dawî keça Lûtfî Barlas, Meryem Barlas ji gundê Omera programa parêzêrî girt, li zankoya Örebro li Swêdê. Hevpeyvînek bi Meryem Barlas û malbata wê re hatîye kirin. Hevpevîna bi Meryemê re di rûpela 74an da ye. Ya bi dê û bavê wê re jî dê di hejmarê *Bîrnebûnê* ya 92an de bê weşandin.

Kurs ne tenê bo îmtîhanê lê bo xwendekaran jî derfetek baş e ji bo têkilîyên civakî. Hinek jî xwendekaran ku hevûdû qet nasnakin lê ji eynî gundî ne, hevûdû li kursê nas dikin û dibin heval. Xwendekarên wek Meryemê ku rewşa xwe

ya kursê baş bû ji yê din re dibe motîvasyon. Wexta ku xwendekar dibînin ku hevalên wan dikevin unîversîtê û programên baş wek doxtorî, parêzêrî û endazî ew baştir motîve dibin.

Weqes ku em dizanim tu kursên din li swêdê wiha nînin. Ew kurs nimûneyek cûda ye. Folkunîversîteta li Swêdê ku pir mezin û navdar e bo kursên cûdan îlan da ku ew dixwazin kursa Waqîfa KANê bixin nav programên xwe. Ew jî potensîyala kursê nîşan dide.

Puana herî mezin 2.0 e. Çend xwendekarên ku terin pola 2 ya lîse û jî pola yekêmin da kurs girtinê di carê siftê da 1.5 puan

girtin. Li swêdê mamostatîya lîse 0.8, hemşîretî 0.5, parêzêrî 1.2 puan, doxtorî 1.75 puan lazim e. Pir xwendekar heger her şemîyê werin kursê tenê 2 saetan piştî salekê nîzikî 1.5 puan digrin.

Kurs bo xwendekaran bêdewa ye. Di navbera dersan de jî bo xwendekaran xwarin û vexwarin li kafeteryeya kursê bê pêre ye.

Piştî demekê bîr û bawariya wan xurt dibe û dixwazin hîn jî programên unîversîteyê yê bilind bixwînin.

Ji bo tekîliya kursê:

Hayrettin Guven

Email: hguven74@gmail.com

Mobil: 070 041 61 23

BI BEXŞÎNÊ
— TEVLÎ PÊŞEROJA ZAROKAN BIBIN —
DONATIONER
— VARA MED OCH BIDRA TILL BARNENS FRAMTID —



Şeva komela Mala Çandê ya Kelhasan li Danîmarkê

Alî Çiftçi

Komeleya gundê Kelhasan a bi navê Komela piştgirî ya Kelhasan, yaylê Hewsên û Delala (*Kelhasan, Turanlar ve Korkmazlar Dayanışma Derneği*) di 07.01-2006 an de li Kopenhagê, bi civîneke berfireh a bi beşdarîya 45 kesan ve hatibû damezrandin.

Li gorî biryarên xwe yê wê wextê hatibûn girtin xebatên xwe heta bihara 2022an berdewam kirin. Xebatên xwe yê wê wextê tenê ji bo piştgirîya gund û dema mirinîyek dibû organîzeyê cenezeyê yê mirî dikirin ji bo bibin welêt.


Piştî 16 salan endam û rêvebirên komelê dîtin ku ji derveyî cenezeyan karûbarên din ku ji bo kelhesenîyên li Danîmarkê dimînin divê bên organîzekirin û xebatên civakî yê çandî (kultûrî) li dîyasporayê ji bo malbat, zarok, ciwan û salmezînan bên kirin. Ji bo vê di 20.03.2022an de

li salona Mizgefta Albertslund Alaaddin bi beşdarîyeka berfireh, destûreka nû bi navê *Danimarka Kelhasan Kultur Evi* (Mala Çandî ya Kelhasan a li Danîmarkê) navê xwe nû kirin.

Bi hîlbijartina endamên nû yê komîta karger dest bi karên xwe kirine. Li gor destûra xwe ya nû komîta karger karê xwe dimeşîne.

Komîtê ji bo avakirina xaniyekî mezin a Mala Çandê ya Kelhasan li Danîmarkê hinek xebat dane ber xwe.

Ji bo piştgirîya vê avahîya mala Kelhasan komelê di 27/10/2024an



de li Kopenhagê şevêka çandî bi malbatên kelhesenî re çêkirin.

Programa şevê bi dengkirina berpîrsên komelê, pêşkeşkirina projeya avakirina xaniyekê bo Mala Kelhasan, muzîk, xwarin, û vexwarin, govend û bi dengkirina mêvana ve hatibû dagirtin

Pêşkeşkirina şevê bi zimanê kurmancî Osman Çifçi û bi danîmerkî jî Dilek Dalanê kir.

Di vê şevê de endamên komîta berê hatin xelatkirin û xebatên wan ku heta roja îro bo kelhesenîyên li Danîmarkê dimînin, bi vê xalatdayîne hatin pîroz kirin û



Bayram Yaşar (serokê nû) û Suleyman Yaşar (serokê berê)



Kasım Özcan yê runiştî Osman Çifçi Foto: Ferdal Turan



Resimek ji şevê

Foto: Ferdal Turan

malavayî li wan hat kirin. Herwiha komîta nû jî ji mêvanên şevê re hatin danasîn û xelat kirin.

Serokê berê Suleyman Yaşar ji komîta nû ya karger re bi kurteaxaftinekê serkeftina wan kir û ji bo piştgirîya avahîya Mala Kelhasan ji hemî gundîyên kelhesenî xwest ku alîkarî bikin.

Serokî nu Bayram Yaşar jî li ser navê komîta karger xêrhatîna mêvanên şevê kir û projeya ji bo avakirina xaniyekê Mala Çandê ya Kelhasan li Danîmarkê da nasîn.

Kasım Özcan jî bi kurtî silav da mêvanên şevê û herwiha çiqas kêfxwaş û serbilindbûna xwe ya ji bo xebatên komelê anî ziman.

Min jî silavek da mêvanan û bi kurtî behsa kitêba ku em li ser gund amade dikin înfomasyon da û girîngîya ku her malbat bi xwe bikaribe hem dara mal-

bata xwe û hem jî serpêhatîya malbatên xwe ji me ra bişînin. Ji bo vê me formeka, ci lazim e ku ji me ra bişînin jî belav kir.

Şeveka bi xwarin, muzîk, govend û bi firotina loto belavkirina hedîya bi rêk û pêk hatibû organîzekirin.

Sponsorên şevê ji karsazên Kelhasan bi xwe bûn.

Stranbêjên ji Kelhasan, Pico Seçilmiş, Ergun Seçilmiş û Neco Altanay bi kilamên otantîk yên li gundê Kelhasan hatine gotin renegekî din dan şevê. Bi muzîka Koma Ciwan hesretali dîyasporayê di vê şevê de hindik be jî hinekî sivik bû. Însanên me li xerîbîyê, li ev welatê wan ê duyemîn li hember kilamên folklorîk ketin destên hev bi saetan heta derengîya şevê wek daweteka malbatî bi hev re govend kişandin.



Dîmenek ji şevê

Foto: Ferdal Turan



Foto: Ferdal Turan

DESTÛRA MALA ÇANDÊ YA KELHASAN

§ 1) NAV Û CÎHÊ KOMELEYÊ

- 1.1. Navê komeleyê Mala Çandê ya Kelhasan e.
- 1.2 Navenda Komeleyê li Kopenhagen/Glostrup, Smedeland 1, Lok.34 2600 Glostrup e.

§ 2) ARMANC

- 2.1. Mala Çand a Kelhasan komeleyek serbixwe, bêalî ye.
- 2.2. Bicîhkirina merasîma cenazeyên endamên me yên mirî (ev ji bo YE û Tirkiyeyê derbasdar e, li welatên din herî zêde 35.000 DKR ji bo lêçûnên endamên me yên mirî tê dayîn).
- 2.3. Organîze kirina çalakîyên çandî.
- 2.4. Vekirina qursên ziman, muzîk, folklor û hwd.
- 2.5. Bûyerek çandî ya ku alîkariya civata me dike.
- 2.6. Hevkariya bi rayedarên danîmarkî re di derbarê derfetên perwerdeyîyê ji bo ciwanan.
- 2.7. Civînen agahdarkirinê yên li dijî sûc û narkotîkê.

§ 3. KOMÎTA KARGER/RÊVEBÎR

- 3.1. Komîteya rêvebir karê rojane yê komeleyê bi rêkûpêk dike.
- 3.2. Komîteya rêvebir ji 11 endamên esil û 4 endamên çîgir pêk tê. Piştî civîna Lijneya Giştî komîte di nav xwe de serok, çîgirê serok, xezînedar û sekreter destnîşan dike.
- 3.3. Komîteya rêvebir piştî Lijneya Giştî organa herî bilind a komeleyê ye û herî kêrîm beşdariya nivê endaman dikare biryaran bide.
- 3.4. Serok bi yek hefteyekê bangî lijneya rêveberiyê dike. Wexta serok nexweş be hwd. di wê rewşê de, çîgirê serok dê tiştên ku li jor hatine destnîşan kirin bike.
- 3.5. Lijneya rêvebir 2 mehan carekê an jî li ser daxwaza 2/3 endaman dicive.
- 3.6. Lijneya rêvebir dema ku hewce bike dikare komên xebatê ava bike.
- 3.7. Serok û xezînedar 2 salan carekê têne hilbijartin. Ji 9 endamên mayî 4 kes bi qismetnazarî beşdarî hilbijartinê dibin.

§ 4. LÎJNEYA GÎŞTÎ

- 4.1. Lijneya giştî organa herî bilind a komeleyê ye.
- 4.2. Lijneya rêveber herî kêrîm 1 meh berê endamên Lijneya Giştî agahdar dike. Lijneya Giştî di meha adarê (mardê) de tê lidarxistin. Divê di vewwendnameyê de roj, cih, rojev û banga tevlibûna lijneya giştî ya endaman were kirin.
- 4.3. Endamên ji 18 salî mezintir mafê dengdanê heye.
- 4.4. Hemî biryar bi piraniyek hêsan têne girtin - ji xeynî guhertinên destûrê, ku hewceyê piraniya denga 3/2 ye.

4.5. Rojeva Lijneya Giştî:

- 1- Hilbijartina encumen û xezîneyê
- 2- Nîrxandina desteya rêvebir.
- 3- Ravekirin û tesdîqkirina rewşa dahat/lêçûnên diravî.
- 4- Pêşniyar.
- 5- Hilbijartina desteya rêvebir û endamên cîgir.
- 6- Hilbijartina muhasebeyê.
- 7- Yên din.

§ 5. HEQÊ ENDAMETÎYÊ

- 5.1. Heqê endametiya komeleyê xerçek salane ye û ji hêla komîteya rêvebir ve tê destnîşankirin ji bo dayîna mesrefên komeleyê.
- 5.2. Di rewşa ku ji endametiye vekişin, dravê nayê vegeandin.

§ 6. HESAB Û ABORÎ

- 6.1. Sala hesabkirinê salek salname ye (01.01- 31.12)
- 6.2. Hesab ji hêla kaseya xeznê ve tê girtin û divê dahat / lêçûn û encam hebe.
- 6.3. Hesab bi rêkûpêk pêşkêşî lijneya rêveberiyê tê kirin û ji aliyê muhasebeyê ku di lijneya giştî de hatiye hilbijartin ve tê kontrolkirin.
- 6.4. Serok û xeznedar xwediyê îmzayê ne.
- 6.5. Serok an jî endamêkî lijneya rêvebir dikare li ser navê komeleyê peymanan çêbike. Ji bo kirîna mal û milk, îmzeya tevahiya lijneya rêveberiyê pêwîst e.
- 6.6. Endam ji erkên komeleyê ne berpirsiyar in.

§ 7. ENDAMTÎ

- 7.1. Kesê ku ji Kelhasan be û armancên komeleyê qebûl bike dikare bibe endam (yên ku ne ji Kelhasan in dikarin bibin endam, lê mafê wan ê dengdanê nîne).
- 7.2. Kesên ku xwe ji bo endamtiyê qeyd dikin û heqê xwe didin, wek endam tên hesibandin.
- 7.3. Mafê her endamêkî ji 18 salî mezintir e ku ji bo lijneya rêveberiyê were hilbijartin. (ji bilî yê di nav parantezê de 7.1)
- 7.4. Lijneya rêvebir dikare bi piraniya denga 3/2 endamêkî ku li dijî armancên komeleyê dixebite ji endamtiyê derxîne.

§ 8. GUHERTÎNA DESTÛRÊ

- 8.1. Guhertina destûrê di lijneya giştî yan jî lijneya giştî ya awarte de tê kirin û yekser tê bi karandin.
- 8.2. Di lijneya giştî an jî lijneya giştî ya awarte de guhertinên di qanûnê de bi piraniya mutleq tê kirin.

§ 9. LÎJNEYA GÎŞTÎ YA AWARTE

- 9.1. Lijneya giştî ya awarte li ser daxwaza nivîskî ya 3/2 endaman herî dereng di nava 2 mehan de tê kirin.

§10. BELAVKÎRÎNA KOMELEYÊ

- 10.1. Di lijneya giştî ya ku 2 sal li pey hev bi navberê 1 sal pêk tê bi dengê 4/3 endaman bi dawî dibe.
- 10.2. Heger bi dawî bibe, xebat û hatinên komeleyê dibin şaredariya Kopenhagê.

Agahiyên têkiliyê:

E-mail: mesajkelhasan@gmail.com

Dansk Kelhasan Kulturhus (Mala Çandê ya Kelhasan),
Smedeland 7 2600 Glostrup/ Danmark

Bûyerên balkêş ji jîyana êzdîyan

Amadekar: Têmûrê Xelîl

... li bal kurdên êzdî adeteke awa heye: berî ku bûka teze lingê xwe bavêje mala xezûrê xwe, zava ji ser banî sêvan li serê wê dixê.

– Gelo çima zava sêvan li serê bûkê dixê? Gunehê (sûcê) kî ye, ku ew usa dike?

– Ji ber ku êzdî li ser axeke usa dimînin, ku di dema xwe da ew war buhuştê li ser rûbarê cihanê bûye û ulm jî dibêje, ku Adem û Hewa li ser wê axê xuliqîne û di wan deman da marek helan daye Hewayê, ku sêva ji darê batinî bixwe û ewê jî bawerîya xwe bi mar anîye û bi şaşîti ew sêv xwerîye û ji ber wê jî ew warê jîyînê êdî wek warekî buhuştî ne hatiye hesibandin, angê, ji wê rojê da buhuşt ji wir rabûye, lema jî kurdên êzdî heta niha jî sêvan li serê bûkê dixin. Angê, bi wî awayî heyfa xwe ji şaşîya Hewayê hiltînin, ku ew bûye sebebê wê, ku buhuşt li wir îdî nema-ye. Bi gotineke din, ji ber ku bi

bawerîya êzdîyan her bûkeke êzdîyan jî peyhatîya Hewayê ye, angê, ji zureta wê ye, ji ber wê jî gerekê ji bo kirina Hewayê bûk û jinên êzdîyan derba wî awayî bixun.

... bi hezaran salan berê (û hetanî îro jî) bal kurdên êzdî cejn-ek hebûye, ku navê wê "Kiloçê ser salê" ye. Ew cejn bi vî awayî dihate pîrozkirin: her sal di pêncşema sisîyan a meha adarê da hevîr distirên, morîkî an jî bişkokekê dixine navê, kade çê dikin, paşê ker dikin, dikine heft perçeyan, para Şems (Şêxê Şem-san), Malxwê male, Memê Şivan (bereketa pêz), Gavanê Zerzan (bereketa dewarên gir), Xatûna Ferxan, Xeta cot (bereketa axê) û hemû neferên malê didinê. Ew morî, an jî bişkok para kê bike-ve, wê salê qismetê wî/wê zêde be, bi gotineke din, dewleta salê wê di serê wî da be. Lê eger para Xudayê malê bikeve, wê salê bela

û qeza wê ji wê malê dûr bin û eger para Memê Şivanê, Gavanê Zerzan an jî Xeta cot bikeve, wê salê gorî wan wê debar, hasilet û rez pir bin. Hetanî berî çend deh salan jî kurdên êzdî nizanibûn, ku ew cejna "Newrozê" ye. Paşê, gava dengê kurd û Kurdistanê kete guhên me jî û me derheqa "Newrozê" da bihîst, me texmîn kir, ku... Kiloçê serê salê ew ya sersalê ye, sersal jî sala nû ye, sala nû jî roja nû ye, roja nû jî nûroj e, nûroj jî "Newroz" e.

...nivîskarê kurd yê di cihanê da bi nav û deng Yaşar Kemal ser êzdîyan ha gotîye: ew mirovan nakûjin. Ji sedsalan zêdetir e ku êzdî hatin kûştin, hatin sirgûn kirin, îşkence dîtin, jêr hatin dîtin; lê dîsa jî serî netewandin, li ber xwe dan û tune nebûn. Li cem mirovan hêzeke wiha heye ku tu caran xilas nabe, narize, namirê; mîna axê, şewqê û avê ye. Ez ne êzdî me; lê ez ji berxwedana wan, mirovahî û dostaniya wan hez dikim. Ji berxwedana wan re rêza min heye. Kesên kujer jî êzdayetiyê têne derxistin. Ew mîna komkujiyekê li şer mêze dikin. Ji bo ku şer nekin, li ber xwe didin. Ji sedsalan zêdetir e

ku di nav xwînê de ne, bênavber mîna lehiyê xwîn ji wan çûye. Eger ji bilî gîhayê, tişteke xwarinê ne dîtine, dîsa jî dilê xwe reş nekirine, dilxweşiya xwe wenda nekirine. Di bin şert û mercên herî dijwar de jî, di qeftên çiyayan bi serbilindî jîyane.

...profêsorê şîrhelal, kurdzanê mezin Olêg Vîlçêvskî herwiha bi pîrsa xuliqandin û pêşdaçûyîna dînê êzdîyan va jî gîro bûye. Ew jî ser bawerîya N. Mar bû, ku dînê êzdîyan dînê perçekî kurdan e, ku kurdan berî îslamê qebûl kirine. Ewî armanc da ber xwe mînanî hevbûn û cudabûna di navbera dînê êzdîyan û dînê îslamê da bide ber hev. Bi wê têmayê ewî sala 1935an di Înstîtûta Moskow ya zimên ya Akadêmîya Rûsîyayê ya Zanyarî da bi têmayên "Varîanta nû ya duakirina êzdîyan", "Bawerîyên derheqa xuliqandina êzdîyan da" doklad xwendin. Bi bawerîya wî, di navbera êzdîyan û tevaya cihana din da ferqeke mezin heye. Ewên, ku dînen din dihebînin, êzdîyan bi vî awahî qebûl dikin: "Eger dînê wana ji dînê tevaya merivaya cihanê tê cudakirinê, eger xudayê wan ne xudayê cînarên wan e, tê wê

maneyê, ku ew xudan şeytan e û êzdî jî xulam û terefdarên wî ne". Hilbet, ev gotin ji nezanîyê tê.

...nivîskar û lêkolînerê kurd yê bi nav û deng Mehmet Gultekîn di nivîsa xwe ya ji bo 90 salîya bingehdar û rêvebirê radyoya kurdî li Rewanê, nivîskar, rojnamevan



Xelilê Çaçan Mûradov (1924-1981) da, ku bi esilê xwe va kurdê êzdî ye, dinivîse:

Dema meriv bi xwendekarên dibistana navîn û lîseyê yên li Almanya li ser çîrokan diaxife, gotin jixwe bi awakî tê ser çîroka kurdî ya Xelilê Çaçan a bi navê *Nimm Dich in Acht vor den Ränken der Frauen* (Ji şerê jina bitirse). Ev çîrok wek mînak di dersên wêjeyê da tê bikaranîn û şirovekirin.

Çîroka *Ji Şerê Jina Bitirse* di nav xwendekarên li Almanya

da gelek navdar e; pirtûka ku vê çîrokê tê da cîh girtiye jî hema hun bêjin, di gelek malan da û di hemû pîrûkxaneyên Almanya da peyda dibe. Ji wan salan virda ye ku Hannelore Marzi wek nivîskar û her wisa wek çîrokbêj ji aliyê dibistan û saziyan tê vexwendin, wisa ku çî bajarên mezin û çî ên piçûk yek nemaye ku ew li wir beşdar nebûbe û ev çîroka sereke jî nexwendibe. Hannelore Marzi dibêje, dema ku ew di beşdariyan da çîrokan dixwîne û carina dora xwendina vê çîroka Xelilê Çaçan hildide dawîya bernama xwe ji bona ku guhdarvanên wê heta dawiyê bimînin. Ew vê çîrokê êdî ji zûda ye ji ber xwe dizane û wê bi zarbêjî pêşkêş dike. Bi ser da ev çend sal in ku ev çîrok wek şano jî hatiye amadekirin û di sahneyên bajarên Almanyayê tê pêşkêşkirin.

Bi kurtasî, ger ku hûn navê vê pirtûkê *Orientalische Frauenmärchen* û/an jî navê çîrokê *Nimm dich in Acht vor den Ränken der Frauen* bidin Google'yê hûnê rastî piştrastiya van gotinan û pêra gelek agahiyên li ser pirtûkê û bi taybetî jî li ser vê çîrokê bên.



KILAMÊN ME (XV)

Mem Xelîkan

ŞÎNA BEKTÊŞ

Încov gundekî girêdayî Cîhan-beyliya Konyayê ye. Bûyera ku bûyî mijara vê kilamê li Încovê derbas dibe. Bektaş, ji malbateka wî gundî ya mezin e. Bi meri û merlixa xwe ve, li yayla wî gundî, Qertela Mezin bi cî û war in.

Sal 1968 in. Li heremê, wê salê berf û baran tinen. Saleke bêavî, saleke ziwahî ye. Apê Bektêş Heco, ji bo ku li gora salê gul û giya hê zêde ye pezê xwe şandîye Goma Milewî. Goma ku nêzî Qertela Mezin e. Rojekê Bektaş jî dixwaze pezê xwe bişîne wî alî. Bi şivanê xwe re dibê “tu pez pere Goma Milewî ez di dû te tîm e.” Heco wê dibhîze, hêrs dibe bi çend meriyên xwe ve te-re ber mala Bektaşê birazî xwe. Dibê „çêra doralî gomê têrî me

herdu ya nake. Tu pezê xwe bi alî yekî din de bibe.”

Bi ser wê de, di navbera wan de xing derdikeve. Heco, bi hêrsê xwe nikane, birazîyê xwe, zavayê xwanga xwe ya bi navê Hemîdê ye, xortê delalî ku hê di bihara jîyana xwe de ye, Bektêş bi qurşînê di cênigê de lédixe û ji jîyanê ve-tiqetîne. Bektaş, bi xopana wê qurşînê li wir jîyana xwe ji dest dide.

Bektaş, 20 salî, xanima vî bûke-ke ducana ye. Ji kuştina Bektêş heyşt roja şuva dergûşa xwe tîne dinê û navê Bektêş lédike. Heco û meriyên wî, cezayê hepsê digrin. Li sala 1974an bi efa Ecevit re, ji hepsê berdidin.

Kilama li jêrî, dayîka Bektêş Eşa Kedê, li şîna wî straye.



ŞÎNA BEKTÊŞ

Ji wê hengorê heta wê hengorê
Dengê motirê tê hetanî wext sorê
Min per û çengê xwe vekirin dan dorê
Mala bavî Bektêş dest min girtin bi çi zorê

De bê dê kwîr dê kwîr daka te bimore
De bê Bektaş Bektaş dîya te bimore
(Dubare)

Gundo Bektaşî min xortekî ji xwe razî
Ê bider rê ketin ap û brazî
Min go Heco qurban lêmêxîne

Te bigota ma here sewê Hemîdê bûkê xwarzî
De bê dê kwîr dê kwîr daka te bimore
De bê Bektaş Bektaş dîya te bimore
(Dubare)

Min go Bektaş qurban dilê dakê te tike tik e
Hîv helat hêstirka xwe da zik e
Hemîda kwîr bî di ber çava da hatî
Cakê li hêla dergûşa bêbav rûne bi lore lorke

De bê dê kwîr dê kwîr daka te bimore
De bê Bektaş bektaş dîya te bimore
(Dubare)

Gundo qurban dîsa berf û baranekê guj e guj e
Ser malê bavî Bektêş girtîye dûman û mij e
Qurbana we me birînê Bektaşî min rind bipêçin
Hetanî dibin ser goristên ma nerije

De bê dê kwîr dê kwîr daka te bimore
De bê Bektaş, Bektaş dîya te bimore
(Dubare)

Gundo henî ya Bektaşî min qul kirin
Îşligê Bektaşî minî spî di xwîna reş da kirin
Perçema Bektaşî min jêkirin birin
Bi pêşî ya teksî ya mêrikê savci da kirin

Çavkanî: Serbilind Kanat

Etnîsîteya çanda materyal ji bo afirandina civakek bi
”bîra” hevpar ku tiştêk li ser ”em” kî ne vedibêje.

MATERYAL Û BERÊ

Prof. Dr. Hacı Akman

Universita Bergenê, Norvec

Wateya tiştan



Têgihiştina çanda materyal

Hin tişt ji bo we pir bi qîmet in. Ew kesayetî û nirxên we diyar dikin, û heta dikarin têlek bi rabirdûya we re bikin. Ji xeynî

têlefona we ya desta, dibe ku we tiştên wek cil, zêr an demjimêr hene ku xwedan barek hestiyarî ya mezin in. Cil û berg şêwaz û tevgera we diyar dike. Paşê zêrên

Ev wêneyên li vir hatine bikaranîn ji Muzexaneyê Brîtanî ji bo projeya zanîngeha Bergenê belgîyên cil û bergên kurdî hatine wergirtin.

me û saetên me hene. Di dawiyê de, tîlefona desta ya rêzdar heye. Civaknasê kanadî Erving Goffman diyar dike ku pêdiviya me bi aksesûarên ku xwepêşandana me xweş dikin hene. Îro, amûrên we yê elektronîkî sembol û îfadeyên we ne. Ew ne tenê hûrguliyên li ser jiyana we ne. Hûn ne tenê wan bikar tînin ku li çaraliyê cîhanê bigerin, têkilî û kar bikin. Ew jî statû, nîrx û gerdûna hestiyarî diyar dikin.

Jin bi tîlefona desta dikene û li ser aksesûarên kesayetiyê difikire. Hin tişt hene ku hûn tu carî naxwazin bavêjin an jê veqetînin. Dibe ku hinek ji wan jî aliyê xizmên we ve hatine wesiyetkirin. Yê din bi tesadufî hatine jiyana we û çîrokekê vedibêjin, ew parçeyek ji we ne. Ev tiştên ku hûn pê re girêdanek hestiyarî ya domdar ava dikin. Çiqas kal û pîr be jî, ev tiştên berê nihaya we tijî dikin û tînin bîra we ku hûn kî ne an jî ku derê tên. Ev erênî û dewlemendker e.

Carinan ew jî nîşkek derbasî nîşkek din dibin, û bi vî rengî şopek hestiyarî ya pir girîng di-

girin. Di van rewşan de, nesneya navborî ji nîşka ve cewhera nasnameya xwediyê xwe digire. Tiştên bi vî rengî, beşeke ku ew kes bû, dîrok, bîranîn, çêj û xwestekên wan diafirîne. Wekî mirovek, hûn hewceyê tiştên weha ne û yê ku bi bêhêz ve girêdayî ne.

Sembolekê materiya di eslê xwe de tiştêk bû, şikestî bû du beş ku dema ku li hev têne danîn bi tevahî li hev dikevin. Ji ber vê yekê ew dikare wekî nîşanek pêbawer a naskirinê û piştrastkirina nasnameya kesek were bikar anîn. Paşê, peyva sembol jî ji bo formên din ên nasnameyê hate bikar anîn, û di dawiyê de ew hat ku hemî tiştên ku ramanek pê ve girêdayî ye destnîşan bike.

Weke mînak dema ku mirov li bîrdariyên wek goran digere û fêrî vegotinên maddî dibe, ev yek bi vegotin û vegotinên bi îşaretên maddî re pêk tê. Ew çarçoveyên vegotinê yê ku gor tê de ne, ku dihêle ku em girîngiya wan fam bikin. Dema ku em behsa civaka Serdema Kevir dikin, ne ew e ku em diyar bikin ku rewş ji bo kesên ku ew ceribandine çî

bû, lê em li ser naskirina xwe ya paşerojê û li ser awayên mumkin ên ravekirinê de pîvanek sembolîk diafirînin.

Sembolên madî yên ji paşerojê bi gelemperî wekî bermayîyan têne binav kirin. Tiştê ku meriv li ser van "bîran" dike, min diyar kir, wekî gotin û çîrok xuya dike. Çîrok ji me re têgihîştina tiştê ku bû. Her çend em di demeka zêde ya perçebûna gotinên li ser rabirdû û çanda maddî de dijîn.

Etnolojî di demên nûjen de dîroka çandên zindî yên nenivîsandî dinivîse, gerokên kevnar dest bi nivîsandina dîroka wînda ya tiştên ku **bav û kalên** me berê çêkirine û bikar anîne, dikin. Koka dîrokî ya mirovan bû referansek girîng û sembolên maddî yên ji paşerojê derbarê kesayetîya mirovan de diyar kirin. Materyal gelek caran ji bo ji nû ve avakirina rewşa dîrokî bû bingeha sereke. Nirxa çavkaniya materyal îro di wê yekê de ye ku ew agahdarîya ku celebên din ên çavkanîyê peyda nakin peyda dike. Tiştên di heman demê de agahdarîya xwezaya SEMBOLÎK, standardên

nirxê yên cûrbecûr diyar dikin, mînakî: "Sînyalên statûya civakî".

Tiştên bi hin taybetiyên nîşangir dikarin ji hêla komek mirovan ve werin parve kirin, û bi gelemperî wekî PEYMANÊN CIVAKÎ têne dabeş kirin, mînakî: Di cil û berg û xemilandina malê de, hêsan e ku meriv tiştên bi fonksiyona nîşangiran ji hev cuda bike.

Tiştên di asta kesane de jî dikarin xwedî nirxek sembolîk bin. Ew hest û bîranînên bingeîn peyda dikin. Dikaribû rabirdû bi nivîsandinê were dagirtin, û bi vî rengî naverokek watedar were dayîn. Di heman demê de, wexta ku avakirina nasnameya kurdî di nav armancên herî girîng ên siyasî de bû, vê çarçoveyên referansê yên hevpar ji bo nirxên neteweyî jî peyda kir.

Bi vî rengî avakirina nasnameyê dikare wekî projeyek di gotara nûjen de were ravekirin ku tê de "xwendinên" taybetî yên materyalên arkeolojîk dihevin. Civaka ku ji rabirdûya xwe tiştêk nizane, di bîra kolektîf de wînda bûye û nikare pêşeroja xwe jî kontrol bike.

Materyal/tişt ji me re hin tiştêkî dibêjin ka meriv xwe çing li gorî şopên tiştên demên berê yên derbasbûyî (rabirdûyê) dihesibîne, çing şirove û têgihîştina di derbasbûna forma nûjen a nû de dide nasîn. Sembolên madî yên ji demên berê pirê caran wekî bermayiyên têne binav kirin.

civakî Erik H. Erikson ve hatiye bikaranîn. Peyvê di axaftina rojane de jî xwe bi cih kiriye. Ew bi pratîkek ku derûdora, maddeyê di forma hilberan de şêkil dide, tê destnîşan kirin.

Lêkolîner Torunn Ekeland (2003) dibêje zanîna rabirdûyê di qada giştî de wekî vegotîneke



Tiştê ku wan nade "jibîrkirin" jî ev e. Zanîna di der heqê dîrokê, nasnameya tişt dide.

Nasname, ev girîng e? Nasname çi ye? Di çarçoveyek zanistiya civakî de, ev peyv cara yekem di sala 1950î de ji aliyê pisîkologê

yekbûyî ya ku çarçoveyên referansê yên hevpar wekî xalên pêwendîya jiyana îfade dike, xuya nake. Gotinên cihêreng ên derbarê çanda maddî û têgihîştinên rabirdûyê de li kêleka hev dijîn.

Çarçoveya civakî û rewşî ya ku tê de rûbirûbûna metnên derbarê raborîyê de pêk tê, dikare xwendin û avakirina vegotinên cihêreng veke. Wergêrê metnê di rûbirûbûna bi sembolên maddî



de jî di ser pêhatiyên xwe de dinivîse û bi vî awayî ji pozîsyona xwandekar ve çîrokên cuda têne avakirin. Şirovekirina metnekê li ser sembolên maddî dikare li gorî wateyên mebest ên metnên ku têne pêşkêş kirin pir cûda be. Tişt û avahiyên ji rabirdûyê, wek nimûne, ne hewce ye ku di qursek rabirdûya vegotinê de werin şîrove kirin.

Kurd jî divê bikaribin mîrîsa xwe ya çandî derxin pêş û nifş bi nifş an jî di navbera bav û kalan û gelên îroyîn de ragihînin. Hebûna mîraseke çandî û nîşandana

wê serbilindiyê dide û nasnameya etnîkî û nasnamê xurt dike.

Ji ber vê yekê, materiyal kultur dikare bi alîkariya "bîra" etnîkî alîkariya organîzekirina rabirdûyê li gorî îro bikin - Bi rabirdûyê re têkiliyeke zêdetir bi xwe re, weke pîvana xwe ya nirxdar a bi niha re dike. Dîroka kurda hem bi ferdî û hem jî bi awayekî komî bi dîroka neteweyî re tê nivîsandin.

Numunek; Tiştên(materiyal) di abîdeya Helebçeyê de bi berdewamî bi hev re di nava diyalogê de ne û em bi awayekî zelal



xêza hevpar a di navbera wêne, teşîs, tablo û bîranînan de dibînin. Dema ku materiyal/nesne bi hev re "axaftin" dikin, wateyek pir taybetî digirin û bûyera ku abîdeyê radigihîne tevdetir dibe. Bi rawestana navên şehîdan û nîgarên bûyerê li kêleka hev, ev

komkujî de eşkere ye. Matriyalbun li ser vebijarkên hilbijartî yên ku meriv dixwaze çi ragihîne, û meriv çawa dixwaze vê yekê ragihîne bingeh e. Ji ber vê yekê, zanîna ku tê ragihandin dikare ji hêla siyasî ve jî hilbijartinek rast be ya ku divê were bîranîn.



yek nêzîkbûneke taybet diafirîne ku eger yek ji wan tiştan ji holê rabe, bi heman awayî nayê jiyîn. Agahiyên ku temaşevan ji nihêrîna nesneyan werdigire biwêj û konkret in, gelo ew bê kontekst in? Ziyaretvan ji bo şirovekirina naveroka abîdeya Helebceyê çi hewceyî zanyariyên berê ne? Wêneyên hovane û plaket bi xwe diaxivin. Ragihandina derbarê

Jenosîd wek wêne û objekt?

Di esasê xwe de mirov dikare bipirse ka gelo mirov dikare bi wêne û tiştên mirî jenosîdek ji nû ve vebêje. Bê guman mînakên pêşangehên weha hem baş û hem jî kêmtir hene. Ez difikirim ku abîdeya Helebce û pêşangehên li wir nimûneyeke baş e. Li vir tişt bi hev re di diyalogê de ne, û em dikarin bi zelalî xêza hevpar a di

navbera wêne, sazgeh, plaket û bîranînan de bibînin. Bi hev re, ew îfade û hestek tevahiya bûyerê û ya ku ber bi wê ve çûye. Dema ku tişt bi hev re "axaftin" dikin, wateyek pir taybetî digirin, û bûyera ku ji hêla abîdeyê ve hatî vegotin tevdetir dibe. Weke mînak dema ku navên şehîdan û nîgarên bûyerê li kêleka hev radibin, nêzîkbûnek taybet çêdibe ku eger yek ji wan tiştan ji holê rabe bi heman awayî nayê jiyîn. Agahiyên ku temaşevan ji lênihêrîna nesneyan werdigire biwêj û konkret in. Ziyaretvan ji bo şirovekirina naveroka abîdeya Helebceyê çi hewceyî zanyariyên berê ne. Wêneyên hovane û plaket bi xwe diaxivin. Têkiliya li ser komkujî eşkere ye.

Monumentalîzasyon li ser vebijarkên hîlbijartî yên ku meriv dixwaze çi ragihîne, û meriv çawa dixwaze vê yekê ragihîne bingeh e. Ji ber vê yekê, zanîna ku tê ragihandin dikare ji hêla siyasî ve jî hîlbijartineke rast be ya ku divê

were bîranîn. Hîlbijartina rast a siyasî ya di abîdeyê de bi rastiya hovane ya bûyerê tê vegotin. Ji şehîdan re cihê ku bi awayekî nerasterast alîkariya gihandina hovîtî û êşê dikin, ji neviyên xwe re jî cihê ku tê de rêz û bîranîna şehîdan tê dayîn. Monumentalîzekirina bûyera Helebceyê bi hîlbijartiyek bijartî ya sembolên cihêreng di forma peyamên siyasî yên cuda de, wek "Endamên Partiya Baasê ketina navborî qedexeye" li deriyê ketina bîrdariyên li derveyî bîrdariyê, tê îfadekirin. Li jor, hin wêne wek nimûne ji van sembolan tene pêşkêş kirin.

Hilberîna çandî ya kurda da divê di çanda kolektîf a kurdî de çawa xuya bibe û zindî bibe? Tîrsa ku mîrîsa çandî derbasî nîfşên din nebe, jiyana wan a rojane xera dike. Qada mijara etnolojiyê çanda "madî" ya bi armanca dîrokî ye, berawirdkirina wê demê û ya niha ye.

ÊMA HEMÊ - II

Hızır Akbîna

GORDO

Gordo nêvîyê birayê Êmê ye, lawê Mamikê Milalî bû. Mamik yekî li ser xwe bû. Ji gund ra nêzî deh salan mixtari kir. Mêrê cimata bû lê xêrnexwastê wî jî pir bûn.

Rojekê ji rojan, Gordo hespên xwe heydine tere ku cote xwe bajo, li çeyrekê hespên xwe ork dike û di nav kilavê xwe de radimedê. Dujminên bavê wî tên Gordo kevir dikan. Gordo xwe li

nav zevîya de vedişêre. Dujmina li dawîya lêgera xwe wî nabînin lê hespan heydinin dibin li ser çîyayê gundê me serjêdikan. Va bûyera bi gundî me pir giran tê. Lê, kê hesp şerjêkirine tu kesan nedizanîye, nikanîne bibînin jî. Bi ser bûyera hespan bi şûva pir najo tilîya Gordo ya girikê kul dibe. Kul çexê kula pîs dibe û ew dimire. Êm li ser Gordo, ji lawê wî Weyselê biçûk û ji bûkê re kilama çex dike. Kilamên Êmê yên li ser Gordo stranê pir bi bandor bûne.

Mala bavî min li navbera harima ye li ûc e

Dîregê orteyê ji zêr û ji tunc e

Gordoyî min li ber mirnîye got

Xelkî heqê xwe ji min dixwazê

Min got felek tu ji Gordoyê min çi dixwazî

Ji te berjêr xwedene sunce

Rê ji dîya narin dîya

Bangê ketîye kokî zevîya

Gordoyî min hespê xwe ork kirin li qîya zevîya

Şev nivî şevê pal li Gordoyî min barandin

Met qurbano mîna tîra marekî xûşî nav zevîya

Siweda rabû hespên xwe ji ork filîtine

Yî bi çîya çîya pekîyê

Çû ozê qorîya hevsarê hespên xwe wanîn

Yên mîna kincên kuştîya ne.

Gordo mir bi şûnda jina Gordo didin mêr. Weyselê şeş meynî jî jê vediqetînin. Êm ve carê jî li ser bûkê û Weysel distirê.

Ezê dînim êzê dînim
Eza tevîrekî heynim
Bi ser xanî Ehmedê Hemê kevim, bixelînim
Arabê Mestî Kinê şiva bişînim
Weysel kî biçûk ji Moxê şiva nîlim
Sur e sur e Moxik sur e
Bi biska çakar gulîyên hûr e
Bûkê mala bavê min ê maqûl e
Ji Weysel kî biçûk dawestîye dûr e dûr e
Wê da wê da bûkê wê da
Lê haqîzê kekê min xwîna lêvên xwe bi te da
Li malê Mestî Kinê bi zit ketî
Bê min Weyselkingê xwe bi îşê we da

Moxik çû bişunda pir najot, şeş mah dû re Weysel bi zarokên malbatê va tevlihev bi surika ketin. Weysel bi surika mir. Êmê vê carê jî li ser Weysel sira. Êşa Weysel bi gundîya pir giran hat.

Lê lê bûkê tu hatî çî yo
Min dergûş nedîye hîn bi duh va
Zêrî bi serî va garî bi guh va
Êdî tu qîmeta te nema ji îro şiva
Darî bêşîkê Weyselî min î ji navê
Beskê Êsê mêjand
Eşê Mihê gerand gavê
Ji çar apan nînan ber sinnetê
Ji salekê şiva kirine hadîgarekê şandin di dû bavê

Va çî hala va çî heval e
Ez a bi derîye malê bavê xwe ketim
Pênc an bi hevra nale nale
Beskê Êmê bi Almasê va yê xwe heldan ber qefesên xwe
Weyselkingê min ro bi niv ro şandin berva bavê

Jêrenot: Hejmara berî vê di bêşa 1ê de me jiyane Êma Hemê nivisandibû lê şaşitîyeka me hebûye. Kesê li Sembûlê ketî hepisê mêrê Êmê nebû, zavê xwe Şîxik bû.

Di parastina nasnameya Kurdên Anatolîya Navîn de rola çandê

Mehtab Îdelî

Çand çi ye?

Çand, awaya jiyan û ramanê ya ku civakekê ji civakên din cuda dike, bi demê re diguhere û bi huner, bawerî, urf û edatan, têgihîştin û tevgera xwe ya bêhempa nasnameya wê çêdike, ye. Ango nasnameya civakê ye. Dîroka gelan li ser çandê ava dibe. Her gel û her welat bi çanda xwe tê nasîn. Gelê kurd jî xwedî çandeka mezin e. Helbet wek her çandê, ya kurdan jî bi tesîra globalîzmê û koçberîyê diguhere. Lê tune kirin, qir kirin û dûrxistina ji çandê, rêbazeke bi bandor a jiholêrakirina wê ya herî mezin e.

Divê ku her kurd çanda xwe

baş bizanibe û xwe ji helandin û guhertinên mezin biparêze. Îcar ev bi çi ve girêdayîye? Çandek çawa dikare were parastin û bigihêje nîfşên din? Bêguman, ev pêşî bi ziman ra dibe. Unsûrên çandî ya her civakê bi rêya ziman derbasî nîfşên nû dibin. Ji ber ku ziman, hem “ramanê” ku çandê hem jî “vegotina” ku wê ramanê dide jiyîn û diafirine ye. Bi gotineke din, ziman ji bo nasnameya çandî hilgir e û pir jî girîng e.

Cureyên wekî muzîk, huner, wêje û dîrokê ku di nav nîrxên çandî yên neteweyan de di rêza herî pêş de cih digirin, bi ziman dikarin werin veguhestin. Û yê

din jî, divê dîroka sîyasî û çandî ya her milletî bê nivisandin. Bêguman wekî ku hatiye gotin, nivîsandina dîroka çandî gelek dijiwartir e ne wek ya sîyasî ye. Lêkolînek zanistî û ya ku bi hevkarîyê were kirin hewce dike. Lê dîsa jî divê tevî her tiştî bê nivîsandin.

Lê mixabin kurd ne xwediyê dîrokeke nivîskî ne. Dîsa jî bi kilamên gelerî yên dengbêjiyê, zimanê devkî, dîrok, çand û bûyerên qewimîn gihandine roja îroyîn. Kok û pêkhatina gelê kurd, serhildan, azadî, bûyerên evînî, destan, lehengî, efsaneyên dîrokî yên bi sedan salan û hwd. di gotinên helbest û kilamên wan de cih girtine. Wan ev kilamên gelerî kirine kevneşopîya çanda kurdî û her wiha bi vî awayî rê li ber windabûna dîrokê girtine.

Baş e, lê jiyana li gor urf û edetan bandorê çiqas li karîna mirovan a ji bo parastina nasnameyan bi sedan dike? Min xwest ez vê meselê piçekî bi mesela ku Kurdên Anatoliya Navîn çawa nasnameya xwe parastine ve, li hev bikim.

Ji welatê xwe yê resen dûrbûn û li erdnîgariya ku lê dijîn bi tenê hîskirin, bû sedemên xem û refleksên xweparastinê yên li hemberî derdora xwe. Û ji aliyê din ve, dizanibûn ku tirk wê çiqas zirarê bidin wan. Ji ber vê yekê ji xwe ra civakeke hundirîn û nîvgirtî ava kirin. Bi qasî ji destê wan dihat, bi miletên li derdora xwe ra zewac û têkiliyên din ên civakî pir kêm çêkirin. Ev yek li herêmê bû sedema zewacên bi hev ra û piştî jî bû kevneşopiyek civakî.

Bi sedan salan li ser tevger û qaîdeyên eşîrtîyê jiyana xwe domandin. Heta salên 50-60î bi nasnameya xwe ya eşîrî û qebîlîyetî li peş bûn. Wan, xwe di nav xwe de bi vê nasnameyê didan naskirin. Heta derengî her kesî hev nas dikir û eşîr diçûn dawet û şînên hevdu. Her dem di her tiştî de -bi piranî ji eşîrên ji heman konfederasyonê-alîkarî û piştgirî dane hev. Gava tişteke diqewimî, mezinên eşîrê û rûspîyan hewl didan ku wê çareser bikin. Bi sedan li gor urf û edetên xwe jiyân. Ew pevrayî,

urf û adet bûn sedema parastina ziman, çand û folklorê wan. Her çiqas dîroka nivîskî û çanda dengbêjiyê ne wek Kurdistanê be jî, wan jî bi destan, çêrok, bi kilamên evînê û şînan zimanê xwe yê devkî heta roja îro anîn.

Di kilamên wan ên gelêrî de jiyan, cîhanbînî, nasname, çand, kevneşopî û edetên wan tên dîtin.

Kilamên şînan/zêmar qala xem û keserên wan dikin. Kurdên Anatoliya Navîn bi şareyên xwe navdar in. Di lorinên wan de şopa ciwanên ku ji bo dewleta tirk şehîd bûne, tên dîtin. Qala firarên leşkerîyê, yên ku dewletê ji wan ra digot eşkîya û ew kuştinî tên kirin. Jiyan, eziyet-êş û tenetîya wan tên ziman. Şînen wan girîng in, di çanda wan de xwedî ciyekî mezin in.

Kilamên evînî qala dilxweşî û xeyalên wan dikin. Dema ku hûn guhdarî dikin, hûn tê de kurdbûn û cesareta wan dîbin. Dikarin ji bo evîn û xeyalên xwe her tiştî bikin. Ger keçikê nedin wî, keçik tê revandin an jî guliyên wê tên jêkirin, da ku ew mecbûrî zewacê bike. Ev dibin parçeyek çanda

zewacê, dibin çêrok û bi salan tên vegotin û digihîjin me.

Her çiqas destan û çêrokên ku ji welatê xwe anîne, hin caran rengên cûda werdigirin jî, dîsa jî her tim nasnameya wan nîşan didin. Her çend wan qet ji we ra negotibin, ku ew ji ku hatine jî, hûn ji destan û çêrokên wan dizanin.

Kurdên Anatoliya Navîn, bi salan kurdbûna xwe qet veneşartin, lê pir jî dervedixistin pêş.

Polîtîka dewleta dagirker û tîrsa wan ew bêçare û bêdeng hiştin. Li ser axên ku jê hatine zêde nedixivîn û bi nav nedikirin. Dema ku qalê kirin jî, tenê digotin "Welatê jê". Em dikarin bibêjin haya kêma kesa ji tiştên ku li Kurdistanê diqewimin hebû. Haya wan ji pîrsgirêka siyasî, ji nasnameya xwe û ji planên tunekirina zimanê kurdî yên ku bi perwerdeya tirkî hatibûn plankirin jî pîr tune bû. Ev pêvajoyê heta nîfşê ku di salên 60-70 de ji bo xwendinê çûn bajarên mezin û xeribîyê berdewam kir. Wan li wir tevger û siyaseta kurdan nas kirin û dest

bi tevlêbûna wan kirin. Hin jî bûne avakerên partiyên siyasî yên kurdî. Piştî darbe û polîtîka 1980an û helwesta tunekirina ziman, ew jî li hemberî vê yekê wekî kurdên din bédeng, bêçare û bi salan bê rexistin man. Lê bi koçberîya bajarên mezin û ber bi Ewropayê ev rewş hat guhertin. Hişmendiya siyasî zêde bû. Awayê parastina ziman, çand û eşîrtiyê xwe bi netewîperweriyê guhart.

Ji salên 90î şûn ve li Ewropayê bi destpêka kovara *Bîrnebûnê* û dûre bi kovara *Veger*, Platforma Kurdên Anatoliya Navîn (PKAN), Waqîfa Kurdên Anatoliya Navîn (*Stiftelsen KAN*) û bi komeleyên eşîr û gundan bûn xwedî rêxistinên sîvîl. Bi vê hişmendiyê hîn bêhtir li ziman û çanda xwe xwedî derketin û parastin. Em dikarin bibêjin ku kurdên Anatoliya Navîn di nav kurdên

Bakur de yek ji ew ê kurdîaxêv in. Helbet ev rewş di nav wan de jî, li gor kesên li Ewropayê û yên li Tirkîyeyê dijîn diguhêre. Kesên li Ewropayê dijîn, di jiyana xwe ya rojane de ji yên li Tirkîyeyê dijîn zêdetir bi kurdî diaxivin. Yên ku li Tirkîyeyê dijîn, bêguman ji ber sîstemê bûne mexdûrên sîyesata tunekirina ziman. Lê dîsa jî tevî her tiştî jî bi salan nasname û kurdîperweriya xwe heta îro parastin û xwedî derketin.

Çand cîvakî ye, dîrokî ye, xisleteke ku divê were fêrkirin û veguheztin e, fonksiyonel e, tê wateya piranî û cihêrengiya di yekîtiyê de, dînamîk û guherbar e. Dîvê her kes li ziman, nasname, çand, paşeroj, hebûn û xwebûna xwe xwedî derkeve û biparêze!

Edward Saîd dibêje “Bandora paşerojê li ser helwestên çandî yên îroyîn, ji paşerojê bi xwe girîngtir e.”

Kavil

Bêrîvan Keskin

Iro heya derengîya şevê li kûçeyên teng û tarî yên bajêr meşîyam. Li jêr xaniyên kevn û li keleka hev rêz kirî. Li jor ezmanekî reng gewrî bê ruh, li tişteki digerîyam. Li tişteki ku min bi vî bajarî ve gire bide. Li bêhna kulîlkên di pencereyan de, li pêjna perên kevokan de, li şopa gavên bira mirovan yên bi dirêjîya kûçeyan diçûn û dihatin de, li tişteki min bi vî bajarî ve girebide digerîyam.

Hina çend gavan bi kolanê de çûbûm baranê lêkir. Ew bira mirovan ya bi kûçeyê de diçûn û dihatin mîna liben tîzbîyeke qetiyayî bi carekê ve belav bûn. Her yek bi alîyekî ve reviya, hinan xwe spartin dikanan hinan jî xwe spartin hundirê kafeteriyan û xwe li kursiyên vala bicih kirin. Ji bilî min û çend kûçikên bêxwedî tu ewdekî Xweda li kolanê nemabû. Qey

baranê tenê bi xemên min û yên wan nikarîbû. Tevî baranê ez bi kolanê de meşiyam, meşiyam û meşiyam, li dawîya kolanê ya mijî dareka têra xwe bilind û berz ji min ve xwûya kir. Barana gelekî bi heybet lê bes kêliyêkê lêkirî tenê siya wê şil nekirîbû. Dema ez gihastim dawîya kolanê min gavên xwe girankirin û li bin siya wê gavekê sekinîm. Min li pejna dilopên baranê yên ji pelên darê li ber lingê min diketin guhdar kir. Bîhnekê nexweş ya mîna zirîçê ji dilopên baranê belav dibû. Jinişkave dengê dapîra min ji wê de bilind bû ” Derî wekin bila bîhna baranê were pozê me.” Bîhna axa şil bûyî xanî dagirtibû. Bi dengê dapîra min re, ez û herdu xwişkên min, me li ber derî totik vedan û li sêyra bîhna baranê rûniştin. Piştî kêliyêkê beqîk ji qûl û qewarên ku xwe ji baranê veşartî bûn derdiketin rûyê erdê. Li nava

hewşê vir de wê de bazdidan. Em jî derdiketin neçîra beqikan. Kêfa min ji beqên mezin re nedihat, min beqikên biçûk ji xwe re hil-dibijartin. Beqakê gelekî biçûçik berve min ve pengizî, min ew xiste kefadestê xwe û berve xwişkên xwe ve meşîyam.

”Ka lê binêrin, min beqika çiqasî şîrîn û xweşik dîtîye!” Çawa ku min kefa destê xwe li ber xwişkên xwe vekir, beqik ji kefadestê min hilpekî û bazda erdê. Carek du caran din jî xwe hilpekand ku xwe bigihîne kendalekî û xwe veşere lê mirîşkekê bi nikulê xwe li beqikê da.

Qêrîn bi min û xwişkên min ket. Dapîra min bi qêrîna me re ji şûna xwe hilpekî û qêrîya ”Eferim ji we re, hûn bûne sebaba beqikê, wê beqika tola xwe ji we bistîne û dest û rûyê we yê tije peqoq bike.” Mirîşkê beqik dabû erdê û bi nikulê xwe heya jê dihat li beqika biçûk dida. Piştî gotinên dapîra min, me di nava hewşê de, da dû mirîşkê û me tiştên ji beqika biçûk mayî ji nav nikila mirîşkê derxist. Beqik êdî mirî bû. Em gelekî ji tola beqikê tirsîya bûn. Me li bin dara since ji beqikê re

tirbek kola û me beqik xiste tirbe, me keviyek jî da ser tirba beqikê û em vegeyriyan malê. Devdelingên me di çamûrê de mabûn. Dema dayika min çamûra li devdelingên mê dît, qerînek bi ser me xist, mîna mirîşka beqika biçûk xistîbû nav nikilê xwe em xistin nav lepên xwe.

Bi galagala mirovên, mîna beqikên piştî baranê ji veşortekên xwe derdiketin, ji dikan û kafeyên derdiketin re min xwe ji nav lepên dayika xwe xilas kir. Dema min xwe ji nav lepên wê xilas kir, min bi destê xwe yê çepê li cotê peqoqkên li wê rojê ve yê li ser destê min ê rastê zîldabûn digerand.

Li derengîya şevê vegeyriyam malê. Gelekî birçî bûbûm. Ez, ya mîna kuçikekî ling şewitî li kûçe û kolanên bajêr gerîyayî, rastê rast çûme aşxane. Min derê sarincê bişûnde li ser bîhna tîrş ya penêr û mêst girt û çûm ser textê xwe yê razane.

Hesreta li nava min, mîna mirîşka nikulê xwe li beqê dida, nikulê xwe li dilê min dida.

Kawil... mal... welat... ve-ger...

Serê min gēj bû!

Dayik

Hemî jiyana xo
Dêkeme girî
Dayê piştî tu mirî
Xoşî min neman
Tu bûyî li ser lêvêt min dayê
Girnijîn û kenî
Kolêt çûna te dayê
Dilê min jenî
Li min bu nîhar û zêmar û şînî
Gulêt baxê min êdî şîn nabin
Li gel behiya te dayê
Bihara min behî
Roja min wergeriya
Hemî bu tarî
Ne tîroşkek ma
Ne çi ronahî
Sîngê te yarîgeha min bû
Mame bê yarî
Ahînkê min di pirr in dayê
Spêda û êvarî
Kovanê te bûne kom
Nijyan dayê li ser vî dilî
Dayê çi cara te nedihêlam
Bûçî nuke tu min dihêlî
Da min jî li gel xo beyî
Bu nav gorî
Dengê te muzik bû
Çendê xoş bû li nava guhî
Hejarek wekî min nîne
Dayê li ser riyê erdî
Ez im bê hêz û heriftî

Kes li hîvîya min namînit
Li êvarî
Li ber derî
Palê xo daye dîwarî
Her kesê borî bipirsît
Te kurê min neditîye hey day gorî
Kurê min direng hatî
Wahe xarna te
Tu yê birsî
Kurê min dê çim nivim
Hişyar bî
Xo baş binixêvî
Şev di sar in li vî demî
Cihê te kes nagirîtin
Dilê min leylanek e tijî hişkatî
Lê zihabun kanyêt diloanî
Ne çipkeka baranê dadikevît ji asmanî
Ne çi ba ne hînkatî
Qurbanî wê tozê bim
Ya li ser pêlava te
Mavdarîya hêja yî
Çend rondika bibarinim
Li ser wî gorî
Dayê nema ew diloanî
Tu bi xodê keyî
Were xewna min
Bêje min, ka ya çewanî?
Bersiva min bide
Her ronahiya van çavanî
Xewa min jî
Wekî rojê min
Tijî girî

Ahmad Barbar

ROJNIVÎSKA LAMBEYA TRAFÎKÊ

Rojvan Enes

Roja yekem

Zaf kes nema li van deran. Ez ê
êdî xwe bi xwe deng bikim.
Dengkirin çima hewce ye? Xwedê
ji bo vê însan afirandine?

Roja duyem

Silav! Lambeya hemberê min
çend roj in li erdê bû. Îro hatin
ew jê kirin û birin. Yeke nû jî pê
ve nekirin. Hejmara erebeyan her
diçe kêm dibe. Yên ji vir derbas
dibin jî tev bi bar in.

Roja sêyem

Îro biqasî şeş seetan ceyran tune
bû. Min hay ji xwe tune bû. Lê
dîyar e tu tevlihevî çênebûye. Va
erebeyek tê. Bi bar e. Bareke si-
vik. Zaroka di erebe da bi tirs li
hawirdor dinêre. Rastî sor hatin.
Hewce nake bisekînin lê ew dîsa
jî disekînin. Jina erebe dajo ji

neynika kelekê li paşî li bajêr
dinêre. Kesk vêket. Hêdî hêdî
dûr dikevin. Wê carek din werin?

Roja çarem

Îro kesek tune. Dema kes tune be
karê min girantir e. Wext dirêj
dibe. Dem nabihûre. Bîranîn tên
bîra min. Şevêkê çend xort pişta
xwe dabûn min, kûr kûr deng di-
kirin. Yekî gotibû; ger ez bûm se-
rok ez dê van lambeyan bi dorê
bikim kesk û sor û zer. Yên din jî
piştgirî dabûn. Bi min pir ecêb
hatibû. Min xwe zanî pelda sor,
zer û kesk vêdikevim. Guherînek
wisa pêkan bû gelo?

Lê dîyar e ew lawik nebû se-
rok. Rengên min neguherîn.
Gelek hevalên min jî serjêbûn.
Pêdivî bi me nema. Wê roja reş
laşê min bi tevahî lerizî bû lê min
tu derbên xedar nexwarin.

Roja pêncem

Îro apê Reşîd derbas bû. Min xwest bigirîm. Ji apê reşîd pir hez dikim. Hesaba wî bihêz bû. Wî tim dizanî kîjan lambeya kengî vêdikeve. Berî ku lambeya zer vêkeve pêla gazê dikir û diçû. Tu carî jî şaşî nedikir. Apê reşîd ez pir baş nas dikirim. Bila herkes biçûya lê apê reşîd neçû ba.

Lê îro zûbizû neçû. Sekinî. Pêşî zer vêket paşê kes. Apê Reşîd li min nêrî. Pişt re hêdî hêdî pêla gazê kir û giran giran derket ji bajêr. Bi xatirê te apo!

Roja şeşem

Ji vir ve bajar bi tevahî xuya dibe. Her roj dereke dî dixele. Bi şevan jî tarîyeke kûr dadikeve ser bajêr. Dilê min naçê qala rewşa wê ya berê bikim. Ez ji wan kêr lam-beyan im ku hîn rih di min de maye. Lê nikarim tevahîya bajêr ronî bikim. Karê min jî ne ew e zatin.

Roja heftem

Li gor axaftinên min bihîstî vî milletî gelek komkûjî dîtibûn. Lê tu caran qir nebibûn. Her car ji

nû ve şîn hatibûn. Lê li vî bajarî vê komkujîyê pişt xelkê şikend. Kesek nema. Êdî çûk jî nayen li ser min nalûsin. Koka min de gîya jî heşin nabin. Nizanim çî li me kirin?

Roja heştan

Li min biborin! Roj gelek tevlîhev in. Îro roja çendan e baş nizanim. Dibe ku piştî çend rojan dinivîsim ji we re. Çûyîn hatina ceyranê serê min kiriye çeqilmast. Lê ev nivîsa min ya heştan e.

Nivîsa nehan

Ger hebûn sûc be, cezaya xwe tenêti ye. Çend roj in kes derbas nebû ji vir. Lambeya herî nêzîk bi kîlometreyan ji min dûr e. Bi tenê serê xwe bi tarîtiyê ra şer dikim. Her şev. Min temirîna hemû lambeyan dît.

Mirina mirovan û çûyîna wan. Xwezî ez jî zûtir biçûyama. Bi vê tarîtiyê re jîyîn ne pêkan e. Îro dixwazim vê jî qeyd bikim. Mirovên vî bajarî gelek qenc in. Piştî vî malwêranîyê, hîn jî dema min dibînin disekînin û bêyî destûra min derbas nabin. Divê

ev qencî naye jibîrkirin. Lê êdî ne xirabên xwe ne qencên xwe, tu kes nema.

Nivîsa dehan

Dîyar e demeke mezin ez di xew de bûm. Dema min çavên xwe vekirin derdora min bêtir rizî bû. Lê hîn li vir im. Ber xwe didim. Xwezî bo xatirê wî serokê biçûk, kesk û sor û zer vêketibam. Û min xeyala wî vejandiba nav vî tarîtiyê da. Lê bi dorê nebe jî rengên xeyala wî va ye hîn li vir in. Li hember vê kavilîyê ber xwe didin.

Nivîsa yanzdehan

Her derê min zingar girtiye. Ev kavilî êdî min jî dike nav xwe. Zêde nikarim ber xwe bidim. Êdî li bajêr tu kes tune. Bes hinekên biyanî hene. Li nav bajêr digerin û talanîyê dikin. Kamyonên wan diçin û tên. Lê qet min guhdarî nakin. Derbas dibin û diçin. Vala tên tijî diçin.

Nivîsa duwanzdehan

Îro jinek hat devê bajêr. Lê derbasî hundir nebû. Erebe da

kelekê rê, peya bû, pişta xwe da erebeyê û li bajêr nêrî. Destê xwe li hev gire dan û nêrî. Paşê vir de wir de çû. Nêzî min bû. Li min nêrî. Hêzeke pir mezin ez girtim. Ser hişê xwe ve hatim. Pişta xwe da min û piçek jî ji vir li bajêr nêrî.

Nivîsa sêzdehan

Dema ceyran hat jinik çûyî bû. Ro li ber ava bû. Kamyonêk kevin li hember bû. Bi hesinan dagirtî bû. Yekî rê nîşan dikir û hêdî hêdî ber bi min ve dihat. Li ber min sekinî. Ajovan jî pêya bû du kes hatin bi min girtin. Dîyar e îro roja min ya dawî ye. Ez ê jî anha vê bajarê biterkînim. Ez ê jî mirinê tahm bikim. Apê Reşîd tê bîra min. Xwezî niha li ba min bûya. Belkî ez ê herim ba wî, kî zane. Ji hevalê xwe dixwaze ku ji jêr da, ji koka min da makîneyê lêde. Ew jî wisa dike. Hemû laşê min dilerize. Her sê rengên min bi hev ra vêdikevin. Piştî çend çirkan tarî dibim.



Ocaxî Malê Bello gundê Ruta Gazê Polatli-Ankara

Dr. Mikaîlî

Hîn tişt hene ku di jîyana meriya da ne, li hêla me dijîn, lê bala me nakşînin an jî wêngê ji bo me bê qiymet in, bê mane ne. Yan jî ew hendû di nav xelkê da nayê bikaranîn, hatiye jibîrkin.

Lê berî 50-60 salî ew tiştana, derana, navana û şûna wan di

nav merîya da pir giran bûn, bê wana nediwû!

Li gundî me û gundên kurmanca yên li dorberê navê mêra wek Taşo pir bûn, me ew bi kar dianîn, ku me bana wana dikir, digot; Xalê Taşo, Apê Taşo!, yan jî Taşoyê Hecelî, Taşo Yehmedî

Macîr, Taşoyê Mehî Selo, Taşoyê
Usî Bîlêl!

Lê me qe li ser vî navî serê xu
nediêşand, nedigot ku ew “Taş” a
bi tirkî çito ketiye zimanî me û ji
lawika, kurika ra bûye nav û çima?

Piştî ku min kitêba li ser
gundî xu nivîsand hin kesê ku ew
xwendine li min vegeŕîyan û qala
va navana jî kirin, qala sebaba va
navlêkirinê kirin.

Ku wana bala min kişandin vê,
min got ka ez lê pirs kim, ka ew
çî ye û ji ku hatiye? Tişteki jî bo
min biçûk û ne balkêş, lê ji bo hin
kesan bûwû nav, heta mirinê li ba
wan mawû! Min pêşta li gundî me
ji Taşoyekî pirs kir, ka çima mezinî
wan navê wî “Taşo” lê kirî bûn.

Wî got li nêzikî gundî “Rutayê
Gazê” kevirek heyî, malê ku la-
wikê wana, zarye wana nediwûn,
berê diçûn wê derê qurbanik ser-
jê dikirin, li ber Xwadê digeriyan
û eger zaro hati dunê, nav dikirin
“Taşo”. Ji boyî xatirî vî kevrî!

Gelo le ku ew bû keçik çî nav
lêdikirin?

Wî got; ”Na piranî kes ji bo
lawika diçûn.”

Lê wî tu qala ocaxikî nekir,

yan jî nehat bîra wî, min jî qe
pê nedizanî û ji bo wê jê nepirsî.

Lê gavik şûnda min ji wî gundî
ji Reçat Akbay pirs kir û wî got;
”Erê, ew kevir hîn jî heyî li perî
gund, di nav hêrga da yî û jê ra
diwêjiin ‘Ocaxî Malê Bello.’ Berê
pir kes dihatin mala ocêx û ji bo
bigêjin mirazî xu li ber Xwadê
digerîyan û dû ra ew diçûn hindê
wî zindarî/kevirî mezin û li ber
pezik serjê dikirin û goşt ji mala
ocax ra dihiştin. Wana jî ew
li fiqara belaw dikirin! Pir kes
wakîna bûna xwedî zaro û lawik.”

Wî got; ”hindik jî be, hîn jî
yekcara kes tên û li bin vî zindarî
qurbanê didin û li ber Xwadê
digerin.”

Min ji wan pirs kir ka çima
navekî bi tirkî, yanê “Taş”, ne bi
kurmancî “Kevir” yan jî “Zindar”
lênakin yan jî lê nedikirin?

Wana bersiva vê nedizanîn
û nikanîn ji min ra li ser tişteki
biwêjin.

Li wê derê me wekî ji vê hîn
şûnên din ku em pîroz dibînin jî
hene. Weka Hewza Îlcê bi masîyên
xwe yî pîroz, ku meri nagrin û
pê îna dikin ku kê xwar mala



wî dişewite yan jî ew ê bişewite. Dîsa li ser vê rîyê darik heye ku jê ra “Dara Zîyaretê” tê gotin, ew jî pîroz e ji bo ku kesekî bigêje mirazî xwe paça pê va girêdidin.

Kal û pîra digotin; hin kesa rûviyek ji bin darê dîne û ew ketî deqlî qertelekî, sîngselekekî û firyaye!

Wexta em zaro bûn ji vir ra derbas diwûn me digot belkî em jî vî rûviyî ku diwe sîngselek û difire biwînin, lê ez qe nebûm şahîdê vê!

Me ew xeyal dikir...

Niha haya piranîya kes û zarokên va gundana ji va tiştane

tunne ye, nema ye! Li ser kevirê Ocaxî Malê Bello bi renga navên hîn kesan û sloganê partîyan hatîye nivîsandin. Wextê rê çê kirin Dara Zîyaretê jî hatibû birrîni, niha li şûnê darik din hêşin bûye, lê tu kes paça pêva girê nade!

Û karkerên demsalî yên ji aliyê Kurdistanê tîn li ser Hewza pîroz kona vedidin û masîyên hewzê digrin û dixwin! Qasî em pê dizanin tu mala kesî jî heta niha neşewitîye, ji ber ku mala wana li pişt wana e û tenê konê wana ne, welatê wan jî 300 sal e ji me dûrtir ma ye!

Helbest

sênfonîya
aqlê hevpar
wekî baxça ye gul û gulîstan
harmonîya rengan û bîhnan
cesarêt û empatîya rewşanbîra
gav bi gav
pêşta çûyîn
li dem û cîh
bilind dibe
bêyî ku piştî xwe bi sîya
xernaxweza dan
aqlê hevpar
ê rîyan fireh û ronî bike
û
li koken xwe yê dîrokî
xwedî derkeve
bi sabir
û
bi îradeya ke azad
dara jîyanê bixemilîne
ji fikrên cûda re vekîrî be
rojê bi dest xwe xe
û li masayên geş û tamxweş
bibe mêwan

Seyfî Doğan



Dayikê min, sewa keçikê min digot, “Tu dizanî, ro bi ro hewik çê dikeve ser.” Yanê, kurikê ro bi ro mezin û gir dibin e. Enterans û gêşbûna min a mûzîkê jî mîna vê şorê çêbû.

Bavê min, ji dayikê min re digot “Va xwarziyê gewenda ye.” Mînak qerfê xwe pê bike him dikenî him jî şadibû ku ez sêz lêxim. Ez lawikê “son kesan” bûm.

Di nav dehûyek xang û birangan de yê paşiyê me. Etikê min digot, “hûn, (ez bi birangî xwe va), li ba kekê (bavê min) yên delal bûn.” Me çi dixwast, ji xwastinên me re zûzkê nedigot, na. Kekê min ji min pir hezdi-

kir. Wekê mînak, di harima me yê gund de bo basketbol bilîzim sahayek çêkiribû. Ciran dihatin û digotin, “Hec Mistefa, va çî ye lo? Ma kurikê te pir delal in ku tu viqes zehmet dikî?” Kek, bi şorên wan nerihet nedibû, bi wê şadibû û dikenîya.

Hewêsa min him bi piano û gitarê him jî ji sêz û bilûre çêbû. “Sang” û dengbejî... her du jî li şûna xwe ne. Di xeyalên min da çi ma bû, ez li gorê wê diçûm.

Hemsalê min li dû tiştên din digerin, ez jî bi sêz, bilûr û gitarê re diqerîşim. Guhê min ê mûzîkê qêm bû. Min xwe diavite nav zor û zehmetîya teknîka mûzîkê.

Navberkê, min li ba hevalên xwe yên Danîmarkî mûzîka

Balkan lêdixist, bi tembûrê. No-
tayên wê pir dirêj bûn, lê min
pir zû nedixwend. Ji bo wê min
li mal qeyde (melodî) gîştik li ser
tembûrê ezberê dikirin.

Rokê me konserek xelas kir.
Paşê guhdarvanek hat ba min û
got, “Tu vana gîştika çing di serî
xwe da digirî?” Min ji çûkî da va
evîsî ku serkeftin xwe bi bixwe
nayê. Mîna etikê min digot, “Her
car hewik cê dikeve ser.” Yanê he-
rik meriya evîsî, him motivasyona
xwe ji tiştî nû re dibe, him jî geş
dibe.

Her carikê mîna têrkek zikî
însên da çerxibe, kelecaneke xwe
hemêz dikê. Hêlkê da dost, heval
û malvat jî herdem teqdîrkirina
serkeftinê ji min kêr nakin. Sala
2014an, kilama “Lê Levendê” li
ser *youtube* û *facebookê* parve kir.
Va, ji min re tişteki ecer bû. Ji’ mik
min ji milyonek kurd re konserek
da ye. Vê kilamê li ser medya sos-
yal pir îlgî dît. Min bixwe jî viqes
çavnedikir.

Kurdên Anatolîya Navîn him
'like' him jî parvedikirin. Xelk
û gundîyên me yên Anatolîya
Navîn êg cara ji min re videoyên
kurikên xwe dişînine. Di wa
videoyan de xuya dike ku ku-

rik kilamên min distirên. “Lê
Levendê”, “Bûkê”, “Dayê”, “Dil”
û hwd. Ez bi hezkirina kurika
zêde şadibim. Ez, ji bo parastina
zimanê dayikê xwe pir bi hêvîdar
im. Jiyan pir xweş e; lê hûner
jiyanê hîn xweş û şîrîn dike.

Di kilaman de peyam pir in:
Di pirtûkeke dîrokî de dibêje ku,
tesîra mûzîkê li ser civakê her tim
hebû, va tesîra qet jî teva nabe.

Mezinên me digotin: “*Zimanê
xweş, ê mêr ji qulê derxe.*” Va rast
e. Pir caran merivên min û hin
malbat, wextê qala kilamên min
dikin, ver dibên: “*Wellehî Ha-
mo, em zêde ne welatparêz in.
Lê wextê em bi kurikên xwe
ve guh didin ser kilamên te
mêla xwe didin kurmancî, ji
zimanê xwe hezdikin. Hîngî
kurdî bi me pir şîrîn tê.*”

Sala 2015an hevalekî hêja
rastê min hat: Rojnamevan A-
dem Özgür. Hevaltîya me hê jî
dewam dike. Alîkarîya wî ji min
re pir bû: Him sewê projeyên me
yên hevpar him ji bo kilamên
min him jî li ser serrastkirina
helbestên ez dinivîsim... Xevn
û xeyalên min û bi Adem ve li

ser zimanê me ne. Em dixwazin zimanê xwe biparêzin û pêşîya bîrbûnê bigrin. Em dixwazin kurikên kurdên Anatolîya Navîn bi stran û videoyan, bi bername û filman zimanê xwe bibînin, guhdar bikin. Sal derbas bûn. Me bi derhêner Mehmet Ali Baran ve jî hevdû naskir. Hevaltîyên wisa meditasyoneke baş e û wek vîtamînekê ye.

Wextê navber dikeve, ez bîra lêxistina enstrûmanan dikim. Wextê diherim nav mala yan jî tetilê, tê'bîk min çend sala enstruman lê nexistîyê. Lewma, ji bo teknîka studio û çêkirinê, çi gerek dibû min xwe diavite nav û dievisî.

Prensîba min ev e: Min dixwest ez azad bim û xwe bi xwe kilaman xilas bikim. Mûzîk ji min re rêyeke pir dirêj e. Paşîya xwe tine ye. Tişt û nûansên jiyanê jî tevanabin. Têşîra xwendinê jî di nav projeyê de pir in. Tu çiqes li deran bigerî, ewqes jî helbest reng dibînine. Şeveke, wexta ez li ba şivanekî mêvan bûm, wê salê kilama "Lo Şivano" derket.

Lo şivano

*Şev şeva çolê pûş û dar e
Dor paş alîyê mişk û mar e
Hîv derketîyê eyazê sar e
Gur nêzik bûyê zûzikê nar e
Pez rabû şevîne toz û dûmane
Qarabeş diewtê qehreman e
Rovî digere pir ê pêvan e
Gurî nêzik bûyê li neqewê wan e*

*Kulav lê dirî, kirasî qelêr e
Xuyê sar bîyê, kî dibê şêr e
Mewzêra xwe bîr kir, gomê li jêr e
Gurî nêzik bîyê şivan nawêr e*

(disgotin)

*Lo şivano yar şivano
Lo şivano dê qurbano
Kerîk pez re bû xwedano
Kerîyê pêz re bû xwedano*

Strana *Lo Şivano* zêde parve bû. Helbestek bi ken û romantîk e. Di kilama *Bûkê û Dayê* da, guherîna çand û edeta kurdan û koçberîya ber bi Ewropayê heye. Di *Birîna Metê* da ez ji bo xort û cîwanan qala rîska Ewropayê dikim.

Bûkê

*Şûna xermana ban e
Sîngê gewrî'b gerdan e.
Dîsa fişek ê li hewa ne.
Tirsim paşîya xwe berdane*

*(dîsgotin)
Lê lê bûkê lê bûkê
Bi ro bi şev li sûk ê
Şorê dê û bava nakê
Por dirêjê aqil çûkê*

*Çivîkê li teqê wîye wîye
Ez derketim seda (sibê) zûye
Li nav gund şemate heye
Bûka ecer revîye*

Dayê

*Dar hêşîne li ber malê
Ne av, ne barane heta salê
Xwe dayê jor kendalê
Benda gulê(n) demsalê*

*Dayê, dayê, dayê!
Vira dîsa birûsk û bayê
Siziyê'l canî min bela bûyê
Dayika minê yê tene mayê*

*Bi girî nivî şevê rabe
Ser singê xwe de, me şabe
Bi derdi giya re heval be
Ro îroj kes (li) dor nabe*

Birîna metê

*Lê mexîne, lê mexîne
Paşportê bişewtîne
Qurban lawî me bişîne
Ma were pezî xwe biçêrîne*

*Keko, min melivîne
Etikê minê pîrr ê dîn e
Ya were tirbê li ser bixelîne
Ya xaniya ser bixelîne
Ya were xaniya bixelîne*

*Qurbana we me ji min dûr e
Kêra xopan weka şûr e
Birîna metê pîrr ê kûr e
Qurban koma xwe yê hûr e
Qemîş mekin komê hûr e*

*Lê mexîne, lê mezîne
Mal şewitîya yo lê mexîne
Qurban lawî me bişîne
Ma were pezî xwe biçêrîne*

Yek cara şîn û yek cara ken
rastîya jiyanê ye. Bi kilama *Dil*, ez
dixwazim hekatên bi ken bîrnebin:

Dil

*Gul û sosin ê dor çîya ne
Mêş û mozê ser civîyan e
Keskesor li ezman e
Çavê min li dû wê ma ne*

*Garî ji bân e, devî bi ken e
Bihar e sal dew nehe ne
Îro li mala me nivan e
Lo va rast e ne xewne*

*Lawik meşî, ewr gurmijî
Kal şengijî, pîr hunijî
Lê lê here xwe pê gîne
Şîrê biroşê ser da rijî*

*Pîşt qerimî heni xudayê
Cem cinî yê qerac mayê
Lê lê anê ji pîstê min nawê
Zik têr kir zevaç mayê*

Min du hekatên berê jî anîn
ziman. Kêzê û Çeneqqelê jî rengê
xwe avêtin ser rojevê:

Çeneqqelê

*Dibên çeneqqelê, çeneqqelê çeneqqelê
Serê me ji ketîyê wê belê, wê belê
Dengê ji dûrê teyê ne ezane dengê selê
Metê, şûna avê xûn dikelê, xûn dikelê*

*Metê, eza îşê xwe bikim mîna berê, mîna berê
Metê eza çîrê xwe vêxim li vê derê, li vê derê
Wextêk gotin xudiyê malê te yî li kuderê, li kuderê
Eza bêm bavê komê min î li eskerê, li eskerê*

Kezê

*Bayeki ûne bilorîne
Berfê çîya bihelîne
Destî wana di me negîne
Bizirê gêwir ji me re mîne*

*Mere mere Kêzê mere
Pêşîya te ket herb û şere
Te ne denge ne xebere
Şunda berva min vegere*

*Mala te bi desta neqîşand
Tulik perde ser da kişand
Mal şewitiya yo pismamî zalim
Cikêra qelem serra kişand*

*Bakî sar e diqeflînê
Pelikê darê diweşînê
Bisangê berfê dibarînê
Kêz hatîyê dev bi xûnê*

Dibê m rabe, bavo rabe, bavê' m rabe
Bavo min negotibû Çeneqqelê, ji me re nabe
Lo lo tu hetak neyî kuştinê, va şera tevanabe
Metê, ma xudanî komê dujmina jî nemira, pir xeraw e

Dibê m metê, qurban metê, lê lê metê
Metê qansera bi salê lê derketê, lê derketê
Te çelê zemeriyê ez derxistim ji nav kulfetê
Hewar cîran' na ez şewitîya me mîna pelkî xetê

Dawî

Ahenga mûzîka modern û ya kurdî pir baş e. Ez kilamên xwe bi şorên etikê xwe û bavê xwe tînim zimên. Çimkî; ew ji gotinên min fam di-kin. Lewma li ba kurdên Anatolîya Navîn kilamên ku heta niha hatin zimên rêyên girîng vekirine lê tiştên nû jî lazim in. Ev jî mûzîka modern e. Heqê xwe em guh bidin kilamên Ewropayê, li harmonîyan wan mêzekin. Ez mêze dikim,

miletê me mêla xwe didin kilamên min; yanê kilamên modern jî bi me xweş tînin. Ez karên xwe veng çêdîkim.

Tesîra mûzîkê li ba me pir e: Li şînan, dawetan û li nav cimaatê kilamên kurmancî distirên. Va tiştên zimanê me li ser nînga digre. Sewa pêşerojê zimanê pê diparêzê. Va tesîreke mezin e! Wekê min li jor jî got, însanê me xwe di kilaman de dibînin, terin xevn û xeyalan.

ferhengok

Zûz'kê tê vateya zû bi zû.

Şor, li hin deverên kurdên Anatolîyê tê vateya gotinê.

Navberkê, tê vateya di demekê de an jî di wextekê de.

Çûki, tê vateya zarokatî, kurikbûnî, biçûkahî.

Evîsî, tê vateya hînbûnê.

Ji'mik, (bi min) tê vateya li gorî min.

Çavkirin, tê vateya hêvî kirinê.

Çavnedikir jî tê vateya hêvî nedikir.

Tê'bik, tê vateya qey, tu dibêjê.

Hevpeyvîna bi nivîskarê Anatolîya Navîn Burhan Sönmez re:

"Ez vedigerim malê xwe"

Adem Özgür

Romana *'Evîndarên Franz K.'* a Serokê PENa Navneteweyî Burhan Sönmez ji nav weşanên *Lîsê* derket. Ev, yekem romana bi zimanê kurdî ya Sönmez e. Lewra Sönmez heta niha hemû romanên xwe bi zimanê tirkî dinivîsand.



Di kitêbên Burhan Sönmez de şopên efsane û karakterên kurdî berbiçav in. Di romana wî ya dawî *'Evîndarên Franz K.'* de, serboriyên cihêreng ên kesayetên xwedî nasnameyên dureh, sûretên kevn û nû yên bajarên Stenbol, Parîs û Berlînê, çîrokên şer û qeyranên siyasî û evîna Ferdy û Amalyayê tev li dora bûyereke kuştinê pêrgî hev dibin.

Kitêbên Sönmez heta niha ji bo 48 zimanan hatine wergerandin. Sönmez kitêba xwe ya dawî ‘*Evîndarên Franz K.*’ bi zimanên kurdî û tirkî nivîsand. Çapa bi kurdî berî ya tirkî hat weşandin. Çapa bi tirkî jî ji nav weşanxaneyê *İletişimê* hat weşandin.

Serokê PENa Navneteweyî Burhan Sönmezê ku ji Kurdên Anatolyaya Navîn e, bersiva pirsên Kovara Bîrnebûnê da û ver got: “Tiştê sereke vegerandina malê ye, ew zimanê me yê dayikê ye. Ez di vê rêyê de vedigerim malê xwe, lê hinek nivîskarên din jî wek ku bixwazin dikarin bi rêya xwe vegerin. Her rê şexsî ye, her nivîskar azad e ku rêya xwe hilbijêre.

“Gundê min bingeha zarokatî û çanda min e”

Li gor lehengê romana “Taş ve Gölge” Avdoyê, mirov nikare cihê jidayikbûna xwe hilbijêr; lê ew dikare li ku derê bimire hilbijêre. Cihê ku mirov lê çêbûye û mezin bûye ji bo we tê çi wateyê? Em di pirtûkên we de rêça Haymanayê zêde dibînin; rol û bandora gund û kurdewariyê li ser ramanên we yên siyasî û pênûsa we çi ye?

– Welat û zarokatiya mirov ji bo jiyane bandorê li ser hişê wê dike. Ger şopek baş di bîrê de bihêle, mirov dixwaze vegere wê rabirdûyê; ger şopek xirab bihêle, her dem jê direve. Ez bêriya rabirdûyê dikim. Gundê ku ez lê ji dayik bûm û lê mezin bûm bingeha zarokatî û çanda min e. Îro jî di kesayet û nasnameya min a çandî û siyasî de cihê wê heye.

“Bêyî nivîsandinê, ez ê nikaribim li welatê xerîbiyê bijîm”

Pirtûkên we her wiha pirtûkên “rê” ne jî. Hûn di hevpeyvîneke de dibêjin, “Her welatê xerîbîyê sirgûneke jî.” Di rêwîtiya we ya ku ji gundekî Haymanayê dest pê kir û ber bi Polatliyê, ji Enqereyê ber bi Stenbolê û ji vir jî ber bi Londonê ve çû de, we hîç xwe “bêwelat/bêwar” hîs kir? Û bi ya we ev gotin gotîneke rast e yan na: “Ji bo mirovên bêwelat nivîsandin dibe cihê jiyane.”

– Min her tim bêriya cihên ku min li dû xwe hiştiye kiriye. Ez bêriya gundê xwe û Stenbolê jî dikim. Ev melankoliyê dide ser dilê min. Li cihê ku hûn lê

dijîn, hûn her gav xwe xerîb hîs dikin. Di wê rewşê de, huner dibe rêyek ku hûn her gav mala xwe bi xwe re hilgirin. Bi taybetî muzîk û edebiyat li vir girîng in. Bêyî nivîsandinê, ez ê nikaribim li welatê xerîbiyê bijîm.

"Ya sereke ev e ku hûn pirsê bipirsin û cesareta vê yekê bikin"

Hûn di pirtûka xwe ya "Masumlar" (bi navê "Hespên Reş Bayên Sorgevez" ji bo kurdî hat wergerandin) de pirsar "Dewlet kî ye?" jî dikin. Hûn behsa zarok û ciwanên di "dersa dewletê" de hatine kuştin dikin. Bi ya min bersiva vê pirsê hê jî nezelal e. Bi rastî dewlet kî ye?

– Rast e, tu bersiv tune. Ji ber ku min xwest li wir pirsê bikim û bibînim ku mirov di wan şert û mercan de çi hîs dikin û çawa dijîn, ku dewlet ji her alî ve dora wan girtîye. Pîrî caran bersiv ne dijawab e, ya sereke ev e ku hûn pirsê bipirsin û cesareta vê yekê bikin. Wêje gelek caran vê rêyê hildibijêre. Mîna siyasetê li bersivên rasterast nagere, lê pirsan berfirehtir dike û derdixe

holê ku mirov dikare bi wan pirsan rêyek nû veke.

"Nivîsandin zanîna pênasekirina hest û ramanên mirovan e"

Pirtûkên we ji tirkî ji bo gelek zimanên cîhanê hatine wergerandin. We vê carê bi kurdî nivîsand. We çawa biryar da ku pirtûka xwe bi kurdî binivîsin, di dema nivîsandinê de we xwe çawa amade dikir?

– Min demek dirêj dixwest kurdî binivîsim, lê tenê berî derketina pandemiya Covidê fersenda min çêbû ku ez li ser vê mijarê bisekinim. Ji bo min rêya nivîsandina romana kurdî; pir xwendina romana kurdî ye. Min hewl da ku her pirtûka ku tê berdestê min bixwînim û bi vî awayî dengên cuda yên edebiyata kurdî fêhm bikim.

Gelek kurd bi tirkî û bi zimanên din ên serdest dinivîsin. Hûn vê çawa şîrove dikin?

– Nivîsandina bi kurdî ji bo min wek anîna xewnekê ye. Ez bi wî zimanî mezin bûm. Yên ku ez bi kurdî mezin kirim êdî

neman. Ez hîs dikim ku ew niha bi nivîsandina min sax dimînin. Zimanê zikmakî wek hesreta malê ye. Lê ji bo min diwariyek hebû ku zimanê min yê nivîskî têra nivîsandina pirtûkan nedikir. Ji bo ku ez bikaribim zimanê xwe yê zikmakî pêş bixim, min wek xwendekarekî xwend û xebitîm. Gelek nivîskarên kurd hene ku bi zimanên din dinivîsînin, wekî tirkî, erebî, farisî, îngilîzî, almanî hwd. Lê divê em bibînin ku, kurdiya piraniyê ji wan têra nivîsandina pirtûkê nake. Ez nabêjim ku ew mecbûr in ku kurdiya xwe pêş bixin û vegerin ser zimanê xwe, lê eger derfet hebe wê baş be. Zimanê kurdî di bin zulmê de ye û pêdiviya wî bi piştgirîya zêdetir ji nivîskar û xwendevanên me yên kurd heye.

Rojnameger û nivîskaran bala xwe dane pirtûka we ya dawî. Li ser vê meselê hin nivîs jî hatine nivîsandin. Xwînerên we pirtûka dawî çawa şîrove dikin, rexneyên çing ji we re tên?

– Kêfxweş im ku xwendevan û nivîskaran pêşwaziya nivîsa min a bi kurdî kirin. Ez bawer dikim ku piştî çapkirina pênc romanên bi tirkî, ji bo min gaveke girîng

e ku bi kurdî binivîsim. Ez hêvî dikim ku ev ji bo nivîskarên din jî bibe mînak. Lê hinek pirs jî hebûn, ji ber ku min versiyona vê pirtûkê ya tirkî jî nivîsand. kurdî ya vê romanê di meha sibatê de û tirkî jî di adarê de derket. Hinek kes jî min dipirsin çima ez bi du zimanan dinivîsim, yan çima versiyona tirkî jî aliyê kesekî din ve nehatiye wergerandin. Di jiyanê min de sê zimanên min hene, îro bi giranî îngilîzî ye. Ez tercîh dikim ku van hemû zimanan bi kar bînim. Mesela ez hewl didim romana xwe ya nû bi sê zimanan binivîsim, ne tenê bi kurdî, bi tirkî û inglîzî jî. Ez nabêjim ku her kurdek dinivîse divê bila wisa bike. Divê em li vir tiştê sereke bibînin: tiştê sereke vegerandina malê ye, ew zimanê me yê dayikê ye. Ez di vê rêyê de vedigerim malê xwe, lê hinek nivîskarên din jî wek ku bixwazin dikarin bi rêya xwe vegerin. Her rê şexsî ye, her nivîskar azad e ku rêya xwe hilbijêre. Mebest girîng e, ew mal e, mala zimanê kurdî ye.

Hûn kelecana xwe çawa tînin ziman?

– Mirov hemû xwedî hest û

ramanên xurt in. Nivîsandin ew e ku meriv zanibe çawa peyvên rast ji bo danasîna wan hest û raman bibîne. Ji bo min, nivîsandin ew e ku meriv li ser wan bisekine û dûv re wan bi gotin û melodye edebiyatê bitewîne. Ev gelek wext digire, lê kêfek mezin e.

Hûn dersên nivîskariyê jî didin. Li gor we nivîsandina bi zimanê dayikê çima girîng e? Li aliyê din, li ba kurdên Anatoliya Navîn jî hewlên edebiyatê hene, nivîskarên Anatoliya Navîn bi kurdî dinivîsin û kitêbên xwe çap dikin. Li ser vê mijarê hûn dixwazin çi bêjin?

– Zimanê zikmakî mafê herî bingeşîn a mirovan e. Ev îfadeya azadiyê ye. Îro roj bi roj hejmar weşanxaneyên kurdî zêde dibin. Ji Amedê heta Stenbolê gelek weşanxane pirtûkên bi kurdî çap dikin. Pêwîst e piştgirîya van weşanxaneyan bê kirin û pirtûkên wan zêdetir bên belavkirin. Ji bo paşeroja kurdî

girîng e ku nivîskarên ji herêm û zaravayên cuda zêdetir xuya bibin.

“Min hewl da bi xwendina zêde, dengên cuda yên edebiyata kurdî fêmbikim”

Burhan Sönmez kî ye?

Romannivîs Burhan Sönmez li gundê Büyük Konak Görmez (Şêxan) yê Heymanaya navçeya Enqereyê hatiye dinyayê.



Sönmez piştî darbeya leşkerî ya 1980an li zanîngeha Stenbolê beşa hiqûqê dixwîne. Sönmez ji ber kar û xebatên siyasî li Stenbolê li navendeke navdar ya îşkenceyê tê girtin. ‘Sûcê’ wî jî ew e ku di dema cuntayê de wî yekem çalakîya xwendekaran organîze kiriye.

Burhan Sönmez piştî xwendina zanîngehê wek parêzer dest bi kar dike û piranî li ser dozên mafên mirovan dixebite. Loma jî ew tim dibe hedefa polis û dadgehên tirk.

Sönmez piştî ku li Enqereyê ji aliyê polîsan ve rastî êrîşan hat û birîndar bû, ji neçarî Tirkîyê terikand û bi sirgûnî berê xwe da Londona Brîtanyayê.

Wî li Brîtanyayê bi alîkariya ‘Navenda Îşkenceyê ya Londonê’ demekî dirêj tedawî dît.

Di wê demê de Burhan Sönmez dest bi nivîsandina romanên kir; di pirtûkên wî de bandora çîrokên kevn yên kurdî hene ku

ji wan gelek îlham wergirtiye.

Berhemên wî yên navdar ev in: Bakur (*Kuzey*, 2009), Bêguneh (*Masumlar*, 2011), Stenbol Stenbol (*İstanbul İstanbul* 2015), Labîrent (*Labirent*, 2018), Kevir û Sî (*Taş ve Gölge*, 2021), *Evîndarên Franz K.* (2024).

Sönmez wergirê xelata wêjeyê ya EBRD (2018), xelata Aştîyê ya *Xemgîn* (2017), Xelata Rûmetê ya çîroka herî baş a *Buyaz* (2015), Xelata wêjeyê ya *Sedat Simavi* (2011), û xelata romana herî serkeftî ya St. (2011) wergirtiye.

Sönmez li zanîngeha METUyê mamostetîya edebiyatê kir, her wiha bû endamê juriya xelata wêjeyê ya Cevdet Kudret (2014), di heman demê de ji bo Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Cenevreyê (2020) berpîrsîyarî wergirt. Her wiha ew damezrînerê TAKSAV, Weqfa Lêkolîn, Çand û Hunerê ya Civakî ye. Burhan Sönmez di navbera Stenbol û Cambridge de dijî.

JÎYANA LI SERÊ MÎN

Bilal Celepli

Ji berê da heta îro li Anatoliyê û Mezopotamyayê kinc û bergên kesen, bo statû û rewşan agah û fikir li ber me dexistin. Bi va agah û fikirên cilûberg didin me, em dizanin ku ew kesa ji ku ye, ji kîjan eşîrî û gundî ye, elewî yan jî sûnnî ye, zewicî yan jî bêkar e...



Xanê û Elik ji Simikan, Kadinhani-Konya

Ji berê da heta îro li Anatolîyê û Mezopotamyayê kinc û bergên kesan, bo statû û rewşan agah û fikir li ber me dexistin. Bi va agah û fikirên cilûberg didin me, em dizanin ku ew kesa ji ku ye, ji kîjan eşîrî û gundî ye, elewî yan jî sûnnî ye, zewicî yan jî bêkar e...

Ji va bergêna yek jî kofi ye. Kofi li Kurdistanê, hîn pir li bajarên Meletî, Semsûrê, û li nav kurdên Anatolîya Navîn bergêka ser serê jina ye. Li çend herêman navê xwe cûda ye; kum, kumik, kulik û kofi tên gotin.

Em li nivîsa xwe bi peyva kofi berdewam kin.

Kofi, darînî ye û pirên xwe ji darên berû çêdiwûn. Paşê ji darên cûda jî kofi çebûn û li dema paşî kofiyên teneke jî derketin. Jina kofi didan serê xwe, ser kofi jî şarpe yan jî kitan didan. Doralî kofi jî bi zêr, zîv û banên herîrî û rengîn dixemilandin.

Kofi, fonksîyona xwe yekemîn por verşîkirin e. Feqet havînî ji germê, zivistanê jî ji sermê diparêze.

Kofi lêkolîna xwe dîrokî û etîmolojî pir zor û zehmet e. Zanayên zimên û filologan jî fikirên xwe ji hev cûda ne. Peyva kofi, li çend zimanên din jî hevdengê



Heykela Tyche li çîyayê Nemrûdê, Semsûr

xwe hene. Mînak bi erebî *kufî*, bi fransî *coiffe*, bi îtalyanî *cuffia* heye û manayên gîştika jî yek in; kumikên li serê jina.

Li bajarê Semsûrê, çîyayê Nemrûdê li serê heykela Tyche jî kumikeka mîna kofî xay dike feqet bo wê tû agah û çavkanîyên bi niviskî ez bi xwe rastê nehatim. Niha werin em guh bi ser jinên Semsûrê din, ew jî ji me ra qalê kofî û çêrokên xwe bikin.

Fatê Akın ji gundê Kurêmilî ye û ji me ra qalê çêroka pîrika xwe dike:

“Li salên 1950î li gund keçikê dergistî mecbûr kofî didan serê xwe. Wê salê ez jî dergistî bûm. Em xîzan bûn, bo wê bavê min ji min ra kofî nestand. Ez heft mehan ji mal derneketim. Eyb bû! Keçikên dergistî bê kofî şûnakin ji mal derkevin. Paşê bavê min genim firt, ji min ra kofî san e.”

Xanim Ozturun 75 salî ye û ji gundê Bulamê ye. Ew jî qalê çêroka xwe dike:

“Jîyana me li ser tûtînê ye. Tûtîn ji me ra xewn û xeyal e. Tûtîn, ji dergûşan ra dîdîk, ji xortan ra qeling, ji mezinên me

ra jî qaymeka kefenê ye. Tûtîn ji min ra jî bû kofî.

Cil, berg û dezgeh ji Halebê bi çerçîyan dihatin. Çerçîyan ji me ra hem xeber hem jî çêrok digotin. Li wê demê çerçî çand bû, kultûr bû, edebîyat bû bi qutayî jîyan bû.

Min jî bi tûtînê ji çerçîyan cil û bergên kofî girtin.

Niha ne çerçî hene ne jî keçik kofî didine serê xwe.”

Îsmîhan Aslan ji gundê Mala-bedrîyê ye, ew jî ji me ra qalê kofîyan veng dike:

“Ez terim şîna, min ji kofîyê serî min nasdikin. Kofî ji serî xwe derxim kes min nasnake.

Em ji kofîyan dizanin kî ji ku ye, ji kîjan gundî û eşîrê ye. Jinên ji eşîra Kawî kitanê didin ser kofî, yên eşîra Îzolî jî berê kitanê didin serî xwe paşê kofî didin ser kitanê. Elewî, jûr kofî bi şerpeka rengîn digirin. Ên Sûnnî jî şarpê di bin kofî ra girêdidin.”

Dîlber Güzel ji gundê Axûçên e, kofî li serê wî jî heye:

“Ez ji kofîyan nas dikim kî Celikî ye, kî Kawî ye, kî zewacî ye kî bêkar e. Berê bêkaran ki-



Îsmihan Aslan ji gundê Malabedri

tan nedidan serê xwe. Zewicîn
şûnda kitanên spî didan serê xwe.
Kofiyên elewîya biçuk in, rindik
in, ên Sûnnîya hîn mezin in. Ez
gîştika ji hev derdaxim.

Niha gîştik serqot in !

Ez bi vî kulikî bûm bûk, bûm
xwudanê kurik kulfeta, nam girt,
şeref girt. Ez ê pê herim bin axê
jî...”

Nav, ziman, gotin, xwarin,
kilam, cilûberg; her tiştêk nasna-
me ye feqet dunê her tim bervê
ûniversalî tere. Hemû xelkên
dunê mîna hev dibin; cilûberg,
xwarin, kultûr ji Kanada heta
Awistralyayê û li Kurdistanê mîna
hev bûne. Hêvîya min û xwastina
min kurd, hem hevdemî bin hem
jî çand û kultûra xwe biparêzin.

Meta Dîlber bi kilameka xwe
heypevîna me diqetîne;

*kulikê me namûsa meriya ne
bira, kuva herî li serî me hene
va cana çûrûmûş be,
bi kulikî xwe va here bin axa sar e*

Sûret û heypeyvîn ji alî sûretvan û
derhener Yalçın Çiftçi hatin kirin.

Gera ber bi welêt ve

Alî Çiftçi

Ji gera ber bi welatê xwe ve bi gelemperî vegera welêt tê gotin. Vegera welatê ku tu lê ji dayik bûye û jiyana xwe ya yekem li wir derbas kiriye, dikare raman, hest û bîranînan bihejîne eger ku tu demeka dûr û dirêj lê nemabe.

Tecrûbeya rêwîtiyek gera welêt girêdayîya ku tu kî ye, çi serpêhatî û hêviyên te hene û gera te çing derbas dibe.

Berî gera welêt baş e ku tu bifikirî ka tu dixwazî ji vê gera xwe çi bistînî, dixwazî çi bikî û çi bibînî? Ma tu dixwazî rêwîtiyek wekî rêwîtiyeka kêfê be an tu dixwazî serdanên ku bi çîroka jiyana te û ramanên te yên bi welat ve girêdayî ne, bikî?

Wê havînê ji bo du hefta piştî demeka dirêj min gereka welêt a bêplan û program kir, ji ber heta hefta dawî jî cûyîna min a welêt ne xuya bû ji bo hinek lêpîrsînên li welêt hatibûn kirin. Spontane ez, kurê min ê biçûk û xanim em bi balafira Sun Expressê ku di sezona havînê de yekser ji Stockholmê

radibe û tere Konyayê, çûn welêt. Herçiqaş yekser diçû, di çar saet û pênc deqîqan de em gêştin balafirgeha Konyayê jî ev rêwîtiya bi min pir dirêj hat, nizamim ji ber hestên bîrkirina welêt bû an ji şika ku gelo ez ê bi rihetî ji kontrola paseportê derbas bibim an na. Baş bû ku min kitêbek kiribû çendê xwe yê desta, ev rêwîtiya ku ji min re dirêj dihat bi alîkarîya vê kitêbê û nemaze naveroka kitêbê ez ji xem û xayalan bi dûrxistim û ez ketibûm nav jînenîgarîyeka dîrokî ya eşîreka sofîyan, gundîyan û çîrokbêjan, zimannasî û bîranînên bavê nivîskar ve dagirtî.

Û rêwîtiyeka epîk a kurekî ku ber bi welatê bavê xwe yê wêrankirî ... Kitêb a ku Ariel Saba bi navê *Babamın Cenneti*, 2008an de nivîsîye, bû.

Bi xêra vê kitêbê, bê ku tirs an xofek li min peyda bibe, em ji ber ku di koltixa pêşîyê de bûn yekser derketin û çûn li ber gîşeya kontrola pasaportê, ez yekem kes bûm,

min pasaporta xwe da memûrê di gîşeyê de bû û wî jî ji min xwest ku ez xwe rind bidim ber kamerayê ku wêneyê min bêt girtin. Ev jî xuyaye ji nîmeta teknîka nîha bi hêsanî dikarin herkesên ku tên welêt bispêrin arşîvên xwe.

Piştî ku çend rûpelên pasaporta min di ber çav re derbas kir û demekê jî li ser ekrana xwe ya kompîtora wî ya gîşeyê mêz kir bi şunda destê xwe avêt muhura xwe û dengê girminîya muhurê hat min, dilê min rihet bû û min fêhm kir ku ez ê bêproblem derbas bibim.

Em bi rihetî derbas bûbûn, berbi şûna walîzan ve çûn. Em demekê li benda walîzên xwe man di vê navberê de min telefona xwe jî vekir ku ji kekê xwe, Osê re ku telefon bikim, min li telefona xwe nêrî ku pir kesan telefon kirine û peyama şandine ka ez derbas bûme an na! ...

Dema kekê min, Osê dengê min bîhîst ku em derbas bûne ew jî kêfxwaş bû û em bi otomobîla wî ber bi Cîhanbeylîyê ketin rê.

Dema em ketin rêya Ankarayê ku ji Cîhanbeylîyê re derdas dibe, em di nav avahiyên îmaletxana yên nû re derbas

bûn bi rastî ev herçiqas derveyê bajêr jî bû bi min wek bajar berbi Cîhanbeylîyê ve rakirine, hat. Senayîyeka mezin a berfireh, li kêleka rê camîyên mezin ên bi mînareyên bilind hatîne avakirin, tu dibê qêy ev der navenda bajêr e. Ne tenê bajar herwiha min dît ku xwazayî jî hatiye guhartin. Li ser wan çîyayên ku Konya dorpeç kirine, tûrbînên bayê, ji bo ceyrana ji bayê peyda bikin bi sedan hatine rêz kirin.

Cîhanbeylî, qezaya ku min li wir pênc salan ders xwendibû, dema em di nav re derbasbûn bi min wek bajarekê mezin û xerîb hat.

Du heftên li gund bi serlêdana xisim û merlixiyê û bi hatina mêvanan pir zû derbas bûn. Di van du heftan de li gund mixabin çar kes mirin, ez li definkirina wan rehmetîyan de beşdar bûm. Rehma Xwadê li wan be ruhê wan her şad be! Bi van merasîmên dilkeştî ez li goristanê rastî du tiştên nû hatim, yek li ser çend kevîrên goran nivîsên bi erebî hatbûn nivîsîn ku xuyaye ev jî rudaneke nû ye. Ya din jinên bi çarşevên rêş (burka) hatibûn dema definkirinê. Ev her du ji bo min pir xerîb hatin ku berê li ba me tunebûn! ...

Qerfo

destî nariye ku
silavekê bide
kûda

kevîrên
aşî gund
bêdeng in

xenê bûm ku
agirê li ezman
meteoroid bû

rupelên tarîxê Hîroşîma
yên zer bûne
ji deran dûr be

Ares dixemilînine
me dixapînine
çûçik bilind difirine

Quto

derva sar e
ber agir
çiqas xweş e

porsipîyê bi tenê
li ser soka nê rûniştîye
dengê dolê

traktorê kewn
li ber malê pas girtîye
dilsozî

hîvê
çîrên balkonê hêstirkan
vemirandin

hafîza
pusêla gela
Das Kapîtal

li dawîyê çiyê
fêza morik
ka êkoya dengên zengila

Seyfi Doğan

QÊRÎNA XEYALÊN PÛÇ

Xizan Şîlan

bextewariya min
mîna avhewayaya demsalan e
carna
diqefilim û dicirifim
germ û dişewitim
nerm û hişk dibim
sar û dicemidim
carna
şîrîn û tehl dibim
ciwan û kal dibim
bi hêrs û sakîn dibim
dilteng û bêhnfireh dibim
carna
wek stêrkên asîmana sayî
diçirisim
wek fenera bêfîtîl û perpitî
vedimirim
di hestên pûç de tîm guvaştin
ez wek talaz û qûma çolistaneke
ziwa me
ji xumexuma kaniya zelal
rondikên çavên melûl
diherikin
nava dilê xêşim
bi guregura reşewrên xeman
dagirtî ye
ken û girîn
li ser rûyê temenê mesûm
qurifîn
jiyana min ya keserkêş
mîna qelşa erdê bejî ye

xewn û xeyalên sitewr bûyî
di ber cankeşiyê de
qîreqîr in
ez bûm leyîstokê pelên şaxa darê
yê li ber toza bagerê
berbabûyî
min bi destê xwe fermana
kuştina xwe da
sêdara îdamê bi stûyê xwe ve
daliqand
ji parzûna birînên kewnegirtî
xwîna reş dipale
kefenê spî termê bêguneh
qebûl nekir
her roj
li hingura êvarên xilmaş bûyî
pişta hêviyên xûzbûyî
miz didim
her şev
tîrêjên stêrkan diherikin
nav deryaya helbestên
hesretkêş
ez ne rastiya xwe me
qalibê siya tesadufan im
hebûna min
di giyanê gerdûna nepenî de
veşartî ye
li berbangên ronak
bi awirên şil li dor keskesora aso
diçerixim
eşq, aramî û azadiyê
li ser çîmenên qefesa yara nazenîn
diçêrînim
ez îsyankarê qedera eniya xwe
yê şingirêdayî me

Bayê xerîb

Adem Özgür

Li va çola Sêwasê wexta nîvro ye, eyam germ e. Ji ber germê bêdengîyek heye. Eg cara vizeviza meş û mozan, di nav qirş û qolan de dengê xişexîşa kûsî, mişk û maran tê lê ew jî ji ber germa nîvro direvin, ji xwe re di bin xwelî da sîyeke digerin. Kûçikekî sergir û birçî jî neçar e. Kûçik, ji konên xwudanê xwe dûr ket, xwe avit kêleka kevirekî, serê xwe kire bin şeqê xwe û ket xeweke kûr.

Kelakela nîvro nehîşt ma kesek karê xwe bike, her kes di bin sîyekê da ketiye xevn û xeyalên kûr: Kûçikê ku di bin sîya kêvir da rûniştî, dixwaze xwe bavêje nav aveke sar, çûçika ewra li benda genim e ku zikê xwe têr bike, kûsî dibêje “xwaska ez bi satkê re di neqewê bigihêm”, jixwe mar li benda mişk e ku wê bixwe, mişk jî ji tirsê marê zer serê xwe ji erdê ranakê. Meş û wêz li doralîya însanan digerin û giran giran xwîna wan dimijin.

Li vê zozanê germ kêf kêfa meş û wêzan e.

Va dera çoleke dirêj e. Xêr ji neqewên piçûk her der mîna hev

in. Erd zer dike. Hemû giya, wekî catir, merdîmelex, parîya mîya hişk bûne. Wexta kereng, kivang û giyayên din ên tene xwarinê nemane. Va deşta ne sewa mirova ne jî sewa berx û mîyan qet ne xweş e. Şivanên pêz neçarî heywanên xwe dibin derên dûr, li av û heşinahî digerin û heywan kêr zêde zikê xwe têr dikan.

Li vê derê panzdeh malbatên kurd hene. Gîştik jî xizmên hev in, yanê ji eşîrekê ne. Ji bo der û deştên kesk, bi av û aram li ker û hespên xwe siwar bûne, berx û mîyên xwe amade kirine, kurikên xwe pêçane, xwarinên xwe heywane ser xwe û hatine vê derê.

Dema li gundê xwe

Li vê gundê Mereşê bîst û pênc mal hene. Xanî li nêzikê hev in û ji kevîrên pûr hatine çekirin. Di navbera xaniyan de metretek an jî du metre hene lê ew jî bo wan qet nebûye sedemên hingan. Bi vê yekê hevdu diparêzin, li hev xwedê derdikevin. Li ber her malê hevşoyên piçûk hene. Di hevşoyan

de xêr ji berx û mîyan ker an hesp hene. Li ber deriyê malan dengê xorizan digihê nav gund, kurik li bar malê bi hev re dilîzin, eg caran gogerçînên xwe difirînin ewra.

Li vir herkes merivê hev in û ew kurd in. Li derdora gund jî gundên kurdan hene. Hinek ji wan elewî hinek ji wan jî sunne ne. Navbera gundan xweş in, kêman caran hing derdikevin, sîva hatin dibin lê ji hev hezdirin. Kurdên vê derdorê, zewacan di navbera hev de dikin, diherin dawet û şînen hev, di şevên dirêj de qala demên berê dikin. Va, bîranîna wan li ser nînga digire. Li vir dîroka xwe ya biêş bibîrtînin, bi zimanê xwe yê kevnar qala der û deştan, zevî û xwelîyan, erd û ezmanan dikin.

Biharê nû dest pê kir. Erd bi av e, derdor kesk dikin û darên sêvan, zerdeleyan û hêrûgên reş kulîlk vekirine. Li ewra dengê leglegan tê guhê kurikên gundî. Legleg li her biharê têne vê derê, diherine ser erdê biav û li vir westîna xwe heydinine. Li dû wan dengê çûçikên ewra jî tên, ew jî bikêfxweşî bi hev re dilîzin, li jor xwe badidine.

Seda zûye, eyam xweş e. Ro dibiriqe. Li derva kesek xuya

nake. Deriyê mala Mestê vebû, Mestê nigê xwe yê rastê dirêjê meresî xwe kir, meresê xwe yê reş û qîlêr pêkir, paşê nigê xwe yê çepê jî giran giran dirêj kir û meresê xwe yê din jî pêkir. Mest kalekî heftê salî ye. Rûyê wî qerçimî, piştê wî xûz bûye, eg cara dicirife. Çavên wî jî rind nabînine. Di deh û du salîya xwe vir de tim kar kiriye. Di nav kawên bi toz de, li zeviyên nîsk û nokan de şuxulîye. Hemaltî kiriye, barên giran li piştê xwe naye, birçî û bêav ma ye, lê koma xwe bi xwedê kiriye. Mestê deriyê mala xwe girt, berva gomê çû û ji hundur tenekeyek yê derxist, li hevşo da ber berx û mîyan. Dengê berxikan di hemû gund gihêşt û wana bi kêfxweşî dest bi testêya îro kirin.

Dev devê siwê ye. Jinikeke pîrê ber mala xwe rêş dike, kurikekî deh û sê salî mangê xwe ber bi naxirê dibe, merikekî mîyê didoşe, jinikê serê mîyê digire. Şivanekî çend mî dane berxwe û ber bi neqewê terê û kilamekê distirê:

*“Şev şeva çolê pûş û dar e,
Dor paş aliyê mişk û mar e,
Hiv derketîyê eyazî sar e,
Gur nêzik bûye zûzikê nar e.
Pez rabû şevine toz û dûmane,
Qarabêş diwê qehreman e,*

*Rivî digêrê pir ê pêvan e,
Gurê nêzik bûyê li ser neqewê han e.*¹

Hemê Miçê seda zû hatiye nav gund, bi tenê li ser keviyekî rûniştiye. Tayek co kiriye berxwe û li erdê tiştêkî xêz dike. Mest jî ji axzê din de berva wî tê, bikêfxweşî silavek da Hemê, wî jî silava wî heyland.

Mestê got, “Çaxa te bixêr. Tu îro zû hatîyî, xêr e?”

Hemê serê ji erdê rakir, li Mestê mêzekir, “Çaxa te jî bixêr. Îro dişlîxê min li mal nehat, ew siwê li dor hev çerx diwime, nizanîm çî bikim.”

Mest bi gotina wî kenîya, “Biya min Eşê tu ji mal derxistîyî.” Hem, li ber vê gotinê ket lê lixwe arnekir.

Hemê Miçê jî di sala Mestê da ye. Hevalê hev ên kurikbûnê ne. Bi hev re mezin bûne, çûne bajêr, di zeviyan de karkirine, li hember gundîyên tirk li pişt hev dastîne û bi wan re hing kirine. Loma jî ji henek û qerfên hev sîva nayên.

Wana bi hev re êpê dengkir, du saetan bi şunda ji axzê din şeş kalên din teva sohbeta wan bûn. Ji nav wan de Ehmedê Îbê jî bajêr

ecer hatibû. Cimatê meraq dikir ku ka li dinyaya din çî heye çî tune ye. Ehmed, ver got: “Îsal eyam xweş terin lê diwêne salê teyî zevî ewqes rind nabin. Heqê xwe em sewê salê teyê tenga din bişuxulin, çîr diwe çîr nawe.”

Mestê û Hemê jî gotina wî dûbare kirin, “Heqê xwe ye, heqê xwe ye.”

Lê meseleyeke din hebû ku Ehmed şaş bû çîng ji wan re bibêje. Ehmed xwe tevdida, nizanî çîr bike, ver got: “Niha guh medin zeviya, xwedê mezin e. Lê li bajêr digotin di nav tirkên de hen derketine pêş, li hember kurdan dijminî dikine. Li hin deran ketine gundên kurdan, xaniyên wan dixelînine, dest davêne erdê wan. Dixwazin kurdan ji vir derxin, me bişînin dereke din.”

Vê dengkirinê dilê wan sarkir, bêdengîyek kete nav sohbeta wan. Ew kalbûn lê ji bo kurik û nêvîyên xwe ditirsîyan, eger ew xebera Ehmedê Îbê rast be dê ew ê çîr bikin, berva ku derê herin?

Mest rabû serxwe, piştî xwe ya xûz paş de bir, ji hevalên xwe re got, “Bayê xerîb va rona destpê dike.”

¹ Ji klama Hamo Celikan, “Şivano”, 2017.

DÎROKA HUNERA TEVNÊ, XALÎ Û KURD

-1-

Muzaffer Özgür

ÇEND GOTIN

Min cara yekemîn dema zarok bûm karê tevnkerîyê li goma me li havînekê dîbû. Bi alikariya çend xortên malê û cîrana tevn hatibû girêdan. Dura jî dayika min li ser tevnê xali honandin. Em zarok jî bi meraq li dorê digeriyan. Carcaran jî dema ji me tiştek daxwaz dibû bi kelecane al dikir.

Eleqaya min a bi xaliya an jî hunera wan jî dema ez li lîsê bûm destpêkir. Dema îlona reş bû û ez li lîsê xwendekar bûm. Ji ber ku min bêşa edebîyatê dixwend, derseka me ya bi navê “Dîroka Hunerê” hebû û memosta me jî jineka kermalîst bû. Rojekê ji rojan di dursa Dîroka Hunerê de mijara me hunera xali çêkirine bû. Memosta me, dema behsa avakirina girên xaliya kir gotibû; “Li ser dinyayê du şiklê gira hene. Yek ya me,

Türk düğümü/Gördes Düğümü, ya din jî İran-Senneh Düğümü ye.” Bi van gotinê wê re min destê xwe bilind kir û gotê, “Mamosta min, gira Senneh ya gelê Aryanîyê, bi ya min jî ew gire ne ya îranê ye.” Bi gotinên min ew pir eciz bû û xwast ez li cîhê xwe rûnim û dengê xwe jî bibirim.

Ew gotinên mamoste ji min re bûn derd. Min xwest ez di pirtûkan de agahdariya bibînim û nîşanê mamosta xwe bikim. Cara yekem, min ji ansîklopêdiya dest pê kir. Ansîklopêdiyên wek *Hayat, Osmanlı, Laurus, Ana Britanika* û Îslamê de bêşa xali, dîrok, nexş, reng û yên din xwedîn û not girtin. Lê ez bi wan terî agahdariya jî natim. Sal jî derbas bûn.

Min berîyê xwe de pirtûkên akademîk, niviskarên bi nav û deng. Min dît ku akademîsyên an jî lêkolînvanên tirk bi zimanekî nijastperest pirtûkên xwe amade

kirine. Li gor wan tevn ji alîyê tırka de hatiyê dîtin. Xali cara yekem tırka çêkirîye. Hat fahm kirin ku gerek ez berîyê xwe bidim pirtûkên niviskarên xerîb. Lê çawa? Gelo, îmkan hebûn? Mixabin tunebûn. Li bajarê Konyayê di Pirtûkxana Bajêr de min çend pirtûk dîtin. Min li dawîyê fahm kir ku karê min dabû ber xwe karekî biha bû, jê re dem gerek bû. Min dosya xwe ji bo demekê di arşîva xwe de parast. Lê her dem di rojname û pirtûkan de nivîsên li ser mijarê dihatin belavkirin anjî çap kirin min dikirin arşîv. Li bajarên Eskîşehîr û Kütahyayê di pirtûkxana zanîngeha Anadoluyê de pir pirtûk xwendin û not girtin.

Di sala 1992an de weşanxana Koral pirtûka niviskar Selaheddîn Mihotolî bi navê *Arya Uygurluklarından Kürtlere* belav

kiribû. Vê pirtûkê ez gelek şa kiribûm. Nivîskar di pirtûka xwe de gelek mînakên dîrokî jî amade kiribûn.

Min rehmetyê kek Cemşîd Bender di sala 1986an de li bajarê Konyayê li ba rehmetyê Kek Fehmî Demîr naskiribû. Dîsa di sala 1991an de min bihîst ku ew li ser pirtûkekê kar dikê û bêşek jî dayê hunera tevnê. Ez bi alîkarîya çend dostên xwe gehîştimê. Ew li Îzmîrê bû. Me ji hev re çend name û agahdarî nivisandin. Dema pirtûka wî, "*Kürt Tarihi ve Uygurluğu*" ji alîyê weşanxana Kaynak de hat belav kirin, ji min re şand. Ez gelek şa bûbûm ku min bi agahdarîyên xwe alîkarî pirtûkekê ya Kek Cemşîd Bender kiriye.

Kelecana min gelek mezin bû. Rehmetî ji min re nivisandibû

ENCÜLLÜ NOT:
Anıttaki William Eagleton
KÜRT HAZIR VE DOKÜMAN SANATINA
GİRİŞ adlı yeni bir kitap yazmış.
Temel düşünce motifleri asıklaanmış.
Bu kitabı ben göremedim.
İzmirde Buluş Sağlayabilirsiniz.
Batasanız bana da lütfen
bilgi veriniz.

William Eagleton'un bizim için içeriği meçhul olan kitabında sürpriz olarak bu konuda bilgilerle karşılaşmamız çok olasıdır. Bu konuda bilginiz varsa lütfen bizimle iletişime geçiniz. İletişim bilgileri: Dr. Cemşid Bender 384 Sk.No: 33 Bayramyeri-İZMİR e-mail: cemshid.bender@kocaeli.edu.tr

Foto: 1 û 2 / Ji du nameyên Cemşîd Bender

ku (Foto-1 û 2), li Amerîka niviskarekî bi navê William Eagleton bi navê *Kurdish Rugs* “*Kürt Halı Sanatı*” pirtûkek belav kiriye û gerek ez xwe bigihînim we pirtûkê. Li ber xwe dayê lê bi serneketiye.

Min bi alîkarîya dostekî di bihara 1993an de li bajarê Zug a Swîsrê di ser weşanxana Balmer (Balmer Verlag) re ew pirtûka li Amerîka hatî belav kirin sîparîş kir. Havîna 1993an ew pirtûk hate gundê min. Dema poste hat ber mala min du re jî arabeyeka din hat. Du kes û yek jî mixtarê gund peya bûn. Wan gotin min, “em polîs in” û qerta xwe derxistin û nîşanî min kirin. Wan paketa min li ber mala min bi îmza teslimî min kirin. Lê bi çi awayî? Pirtûka min a bi 49 dolara kirîbû xwestin li ber çavên min bişewitînin. Heqeretî bi min kirin. Min xwe avête pirtûkê lê nebû. Yekî gote min; “Em te nasdikin, dizanin, ma li welatê me pirtûk xelas bûne! Tu ji Amerîka pirtûka dikirî?!” Min li ber xwe de ku xwe biparêzim lê nebû. Yekî bi pirtûkê li milê min xist. Berga wê ya rengîn û xwaşik li ber çavê min çîr kir û avit ber lingê min. (Foto:3/4)

Mixtarê gundê me kete navbera me ku ew kes li min nedin, ez parastim. Ez gelek xemgîn bûm. Min biryar da ku ez di salên pêş de li ser Hunera Tevnerî-Tevnê nivisekê an jî pirtûkekê amade




Foto: 3




Foto: 4

bikim ma li hemberî van zor-darîya bibe bersivêkê.

Arşîva min, gelek pirtûkên min ronîya çavên min bûn. Min ew vedişartin. Dema ez di sala 1995an de derketim

hatim Ewropa pir îmkane min çêbûn. Xeyala min a pirtûkê amade bikim mezin bû. Ez di pirtûkxana de ketim nav pirtûka. Ji bazarên pirtûkên kevn lê tîn firotin pirtûk kirîn. Proja kovara me Bîrnebûnê, enerjîya min a pirtûk nivisandinê berva alîyê edebîyata kurdî bir. Sal û demsal derbas bûn. Min nekanî ez pirtûka xwe amade bikim. Di hejmara sêyemîn ya bîrnebûnê de bi kurtayî bi zimanê tirkî nivisek amade kir. Çend havalên ku dizanîn arşîva min û eleqa min li ser hunera Tevnê heye ez rexne dikirim û digotin, “kovara we wek ansîklopedî ye, eger dema te tune çima tu di kovarê de wek rêze nivis nanivisîn! ...” Min biryara xwe da, ez ê di kavarê de rêzenivisekê belav bikim.

RAÇANDÎN, TEVNKERÎ-TEVN

Tevnkerî, honandin; di dîroka mîrovatîyê de gelek kevnar e. Însan ji ber şert û mercên xwezayê xwe biparêze herdem çareyek dîtîye. Di lêkolînên arkeolojîyê de hatîyê dîtin ku mîrovatîyê di destpêkê de ji bo canê xwe biparêze postê heywana bi kar anîye. Du ra

jî qamîş, lîfên nebatên cûr be cûr, gîya, pel ên dara bi kar anîne û bi wan hesir honandine û şiklên rûxar avakirine.

Lekolîner qebûl dikin ku di dîroka mîrovatîyê de hatîyê tespîtin ku însana bi qamîş hesir honandine bi va şikla dûz teknîka honandinê pêş xistine û gelt çêkirine, li dawîyê jî xaliyên bi gire keşf kirine. Tevnikirin di destpêkê de wek îxtîyacek hatîyê amade kirin lê li dawîyê berfireh bûye, di jîyana mîrovatîyê de bûyê malzeme nîşanî sosyo kulturî.

Di dîroka mirovahîyê de gelek nîşan hene ku di destpêkê de karê tevnê ji bo, qumaş raçandine, çêkirinê. Cil û bergên amade kirin ji materyalên raçandinê ji bo karê jîyanê sivik bikin hatîne bikaranîn. Di demên cûda de li Mezopotamya, Ewropa, Çîn, Mongolîstan, Sîbîryayê, Afrîka, Amerîka Başûr mînak hatine dîtin. Li dinê, dîroka teknîka honandinê li gor berhemên arkeologa yê li cîhên cûr be cûr de hatin dîtin û keşf kirin bi cîhê hatin dîtin navûnîşan kirine. Li gor wan agahdarîyan, dîroka raçandinê digêhêje 8000 salên BZ. Dema însan derbasî jîyana şikefta-malê

bûye heywan kedî kirine û bi we re jî karê honandinê ketîyê nav jîyana mîrovahîyê. Bi sîstemeka du ben a dinav hev re derbaskirinê re şikleka tekstîlê ava kiriyê û bi vê şiklê raçandin çekirîye. Li gor ditînên arkeolojîye cîhên qumaşên bûne karbon lê hatin dîtin Anatolîyê, Mezopotamya-Kurdîstan, Girava Kibrisê, Girava Giritê, çend giravên din ê Behra Spî û Yonan e.

Di kolandina cîhê Çatalhöyük-ka Anatolîyê de tiştên tevnkerîyê, derzi, haletên herî risînê hatine keşf kirin. Bi sîstema karbonê (C14) dema wan heta 7000 sal BZ. paşva tere. Xêrî wan bi dîtîna çend perçeyên raçandinê jî hatîyê fahm kirin ku wê demê de raçandin di jîyana mîrovahîyê de hebûye (Mîne Erbek, *Çatalhöyükten Günümüze Anadolu Motifleri*, Ankara-2000).

Li dawîya salên 1970î li welatê Çînê, li herema Sincanê mirîyên di nav kûm a bi xwê de hatine veşartin hatin dîtin. Li gor tespîta kar. bonê (C14) çend ji wan 4 hezar salî û hîn jî kevnar hatin tespît kirin. Ew baş hatinê mûm kirin. Goştê wan, çêrm, hesti, porê wan pir baş hatine parastin. Li ser wan

mirîyan xeftanê rengîn, şal, ce- ket, sol û kulik hatine dîtin. Ew ditînên arkeolojîk niha li Çînê-Urimçiyê de di muzexanê de tên parastin. Arkeolog Dr. Elizabeth Wayland Barber dema li ser van lêkolîna xwe xelas dike û dibêje, "Ew kes ji rojava hatine vir. Mêr û jina bedenên xwe li gor gelên heremê pir dirêj in. Seri û şikla wan wek ya nîjad a kesên spî ye. Ne wek mîna mongol û çînîya ne. Mêr bi rûyên xwe yên reş û pir, êşkere dikin ku ew kes ewropî ne." Dr. Barber eceb dimê ku kulikên wan wek yê frîg ên li Anatolîyê ne. Dr. Elizabeth koka wan digihêjîne Brîtanyayê, gelê kelt. Wan heri bikar anî- ne û qumaş hûnandibûne (*The Mummies of Urimchi*, Elîzabeth Wayland Barber-1999-DYA).

Dema min ew nivisa Dr. Bar- ber xwend, pirtûka "*Meleklerin Küllerinden*" ya Andrew Col- lins nivisandî (Avesta-2009) û *Hêstirên Granîayê* ya E.A. Nolan nivisandî (Apec-2016, çîrok) ha- tin bîra min. Andrew Collins di pirtûka xwe de bi agahdarîyên olî, dîrokî, arkeolojîk, çîrok û he- katan re behsa ji dema neolîtîk va koka gelê kurd dike.

Li Mesopotamyayê, di bawerîya zerdûştî de sterknasan (magî) ya jî kulikên xwe dirêj wek kovikan bûne. Dema Nebî Îsa ji dayik dibe sê magîya ew zîyaret kirine. Di pirtûkên pîroz de ew hatiye nivisandin (Încîl-Matthäus 2, 1-2).

3000 sal BZ. Li Hîndîstanê pemû hatiye bi karanîn û we demê de li welatê Çînê jî hevrîşim hebûye.

Li Kurdistanê Amed-Çayönü û çend cîhên din berhem hatin dîtin. Li xerebeyên Ûrartûya ku li bajarê Wanê jî parçeyek qumaş hat dîtin û 700 sal BZ. hat bi sal kirin. Dervayî vî qumaşî gelek materyêlên tev û dûrîne jî hatine dîtin (Oktay Bal, *Tarih boyunca Van*. Ist.-2007)

Di kolandina arkeolojîk yên li paytaxta şaristanîya Frîgya Gordîonê de bi şiklên geometrîk

ji herî û keten parçên raçandinê hatinê dîtin. Ew bi sedsalên 8-7ên BZ. tîn bi sal kirin. Li Gordîyonê gelt û xali dihatine hunandin û bi wan re jî Tapates hatiye gotin. Tapates him ji bo di mal de rexistinê him jî ji bo xemilandina cîhê tê dijîn hatine bi kar anîn.

Ez dikanim gelek mînakan bidim. Ji sümera, ji hîtîtan jî ji frîga. Lê bawerim ji bo rêzenivisekê ev mînak tîr dîkin. Niha, ez dixwazim li ser tevnê çend mînakan bi agahdarî û resma bidim.

Li Mezopotamyayê li ser zînanan dezgeha tevnê hatine dîtin û ew bi 2400 sal BZ. hatiye bi sal kirin. Babîl di dema xwe de bûye cîhê xalî hûnandinê, tevnê. Ev huner ji Babîlê derbasî gelên Aryan bûye (Bender, rûpel 175).

Xêrî wê jî di hunera Misirâ kevnar de, di 1400 sal BZ. de dezgeha



Jineka tevnê çêdike, li Mesopotamyayê hatiye dîtin.



Li Misira kevnar tevn

tevnê hatîyê teswîr kirin. Li wir nûmûneyên tevnê yên dûz pêra “Kopt” tê gotin jî hatine dîtin.

Li Yonan li ser guldaneî û nexşên dîwara, mozaîkan; raçandin, tevn û cûr be cûr kargêritîya qumaş hatîyê tespît kirin.

Li ser honandin û tevnê meriv dikane gelek mînakên bide. Li welatên Amerîkaya Başûr, Afrîka, Welatên Asya dûr, Çîn û

Hîndîstanê jî tevn hatîyê bi kar anîn. Lê di coğrafya pez lê heye gelek pêş ketîye. Qumaş çêkirin, ber û gelt çêkirinê bi şunda xali hatîyê honandine. Xali çêkirin di jîyana merivahîyê de wek hunereka tevnê gehîştîyê asteka bilind. Gela li ser gelt û xalîyan de jîyana xwe, êş û şabûnên xwe, xezaya tê de dijîn neqş kirine û heta roja me jî hatîye.



Motîvên ser guldaneî, 560 sal BZ.

Bi Meyrem Barlasê re hevpeyvînek*

Tu dikarî bi kurtasî behsa xwe bikî?

– Navê min Meryem e. Ez 20 salî me û ji gundê Omera me. Bi alîkariya kursa îmtîhana unîversîteyê min beşa hiqûqê ya Zanîngeha Örebroyê qezanc kir.

Tu çîng bi kursê hesîya?

– Bavê min ê ku Hayrettin ji berê ve nas dikir ve hate pêşnîyazkirin. Lê belê, ji ber ku min berê qurs qet nebihîstibû, ew neçar ma ku min heta demekê îqna bike, lê ji ber ku îro ez anîme cihê ku ez lê me, ez gelek spasdar im.

Gava te dest bi kursê kir, fikrên te yên pêşîn çi bûn?

– Gumana min bû û ne difikirîm ku ez ê tiştek fêr bibim ji ber ku ne matematîkê û ne jî swêdî taybetmendiyên min ên bihêz bûn, nemaze dema ku min 12/40 li ser testa yekem a îmtîhanê li ser kursê girt. Ez jî pir matmayî mam ku çend kes mijûl bûn û bi

cesaret dikirin ku bersivê bidin herçiqas bersiv nedîzanî bûn jî, wê bawerî da min ku ji şaşîyan netirsim.

Ji destpêkê ve te dixwast bibî parêzer an ev fikra di dema kursê de hat?

– Di pola 9an berî destpêka xwendina lîseyî divê meriv beşekê hîlbijêre, mîn di destpêka da dixwast xwendina hiqûqê bikim. Di serî de, tenê ji bo wê yekê bû ku dê xwendineka ne pir zor be û hev kêşeyên matematîkê dê tê de nebin. Lê bi demê re, eleqeya bi mijarê re mezin bû, nemaze dema ku meriv fêr dibin bê ka çima hin qanûn hene û dema ku kesek ji sûcekî mehkûm bikin, divê meriv çîng bifikire û ceza bike.

Li gor te, kursê çawa alî te kir ku tu ji bo îmtîhanê (azmûnê) bi pêş ve herî?

– Di kursê de, ez ji bo çareser kirina pirsgrîkên matematîkî

* Heypeyvîn bi zimanê swêdî hatiye kirin. Alî Çiftçi ev wergerandîye kurmancî.

gelek rêbazên cuda hîn bûm, wekî çawa bi lez bikaranîna arîtmêtîka derûnî(zîhnî) bi nas-kirina hev kêşeyan di wextê da. Bi hêzên ku Hayrettîn ji me re got ezber bikin, me pelên formula yên bi potansiyel jî ji wî wergirtin. Di dema îmtîhanê da pir kêr hat. Lê ew ne tenê matematîk bû ku alîkarîya me kir, swêdî û îngilîzî jî. Hûn nikarin texmîn bikin ku kîjan pirsên li ser beşa devkî dê werin, lê wî şîretên pir baş dan me ka meriv çing bersivên xelet ji holê rabike û bi vê rêyê bersivên rast bibîne. Ew mamosteyekî pir baş bû û ew wexta ku wî bo alîkarîya me daye ez pir teqdîr dikim.

Hevaltiya li ser kursê çing bû?

– Di qursê de civateke weng dela hebû. Gelek rûyên naskirî hebûn, ji ber vê yekê di destpêkê de zehmetî kêm-tir kir. Lê pir neçû ku her kes bi hev re hevaltiyê bike.

Nêzikbûna malbata te ya kursê çin bû?

– Dê û bavê min qurs pir cidî girtin û di esasê xwe da me tu ders ji bîr nekirin. Malbata min bawer dike ku heke kesek bi rastî jî înnîsyatîfê bigirê û biceribîne, li şûna ku hûn destûrê bidin ku şert û mercên we

yên nebaş sînordar bin, her kes di-kare bibe xwadiyê tiştêkî pir baş. Ev tiştêk e ku ez ji bo wê gelek spasdar im. Nehîştin ku ez dev jê berdim û ez hîs dikim ku bi rastî jî pêdivîya min pê hebû.

Tu kursê ji kesên din re pêşnîyaz dikî û çima?

– Bi rastî jî dikim! Heke bi rastî jî tu bixwazî hîn bibî û hewl bidî hîn bibî ev pir sûdewar e. Ev kur-sek e ku ez ji 0.8ê heta 1.15ê girt, heke ez bikarim bikim, her kes dikare vê bike. Ez pêşnîyaz dikim ku tu bi temamî bawerîya we bi hemû zanyariyên xwe yê berê neynî, li vê kursê bi awayên nû tu hînî tiştan dibî. Bi rastî jî dema tu fam dikî ku tu çî dikî, her tiştî pir bikêftir dibe.

Gava tu pê hesî ku te îmtîhana universîteyê ku di dilê te da bû qezanc kirîye, te çî hîs kir?

– Bi rastî jî rehetîyek bû. Hemî de-ma ku min ji bo îmtîhana têketina zanîngehê dixwend bi kêr ha. Di destpêkê de ez hinekî di nava şokekê de bûm û ev çend rojan de-wam kir heta ku min fêhm kir ku ez ê di dawiyê de tiştên ku min ewqas dem xeyal kiribûn, bixwînim.

Ji malbata te û yê derdora te çi reaksiyon hatin?

– Her kes ji bo min pir kêfxweş bû. Dema min xeber girt em li gundê xwe yê Tirkiyeyê semestrê bûn. Min bi tenê ji malbata xwe re got, lê belê heta dawîya rojê hema bêjin temamiya gund xeber bihîstibû. Ez pir kêfxweş dibim dema ku difikirim bê ka dê û bavê min çiqas serbilind bûn wexta ku mizgînîya xeberên baş bihîstin.

Niha li dibistanê çing tere?

– Baş tere, lê ji ber ku sala yekem e tempoyeke pir bilez e. Di nav çar salan da gelek agahî hene ku divê tu hîn bibî û pir berpirsîyarîya kesane heye û gelek saetên ku tu xwendinê xerc dikî. Lê ez tam li cihê ku divê ez lê bim û tiştê ku min dixwest dikim, ji ber vê yekê ez spasdar im ku min ev derfet jî wergirt. Ez li bendê me ku ez her tiştî fêr bibim û bi jêhatîbûnê roja yekem ku min lingê xwe avêtibû zanîngehê li ba min nebûn mezûn bibim.

Gava te xwandina parêzerî teva kir, tu dixwazî di pêşerojê de çi biki?

– Ez hîn nizamim, lê ev bi temamî bedewîya bernameya hiqûqê ye. Mijar ewçend berfireh e ku gelek alternatîvên min ên cuda hene ku ez ji wan hilbijêrim. Rojêkê dixwazim bibim parêzerê bacê û roja dinê jî dîplomat an jî li Komîteyaeka Riksdagenê. Lîsteya îhtîmalan hema bêje bêdawî ye. Ji ber vê yekê tiştê ku ez dixwazim bibim wê pêşerojê nîşan bide.

Niha tu ji kursê bîrîya çi dikî?

– Ez dema li kursê bûm bîrîya rûtînên wê wextê dikim. Nav hefteyê de ez li pirtûkxaneyê rûniştim û min xwendinê dikir, rojên şemîya jî ez diçûm kursê ji bo pirsên ku min zehmetî dikêşand alîkarî werbigrêm. Ez bîrîya xwendina kursa îmtîhanê li gel hevalên xwe dikim. Gelek merivên me ku di rojên şemîyan de ji bo hînbûna kurdî dihatin loka kursê hebûn û me wê demê pir hev didît. Ez bîrîya dîtina wan dikim.

Intervjun med Meryem Barlas

Kan du berätta kort om dig?

– Jag heter Meryem, är 20 år gammal, från byn Omera i Centrala Anatolien och har med hjälp av högskoleprov kursen kommit in på juristprogrammet på Örebro universitet.

Hur kom du veta om HP kursen?

– Jag blev rekommenderad av min pappa som kände Hayrettin sedan innan. Han behövde dock övertala mig ganska länge då jag aldrig hade hört talas om kursen innan, men är väldigt tacksam då det har tagit mig till platsen jag är på idag.

Vad var dina första tankar när du började på kursen?

– Jag var väldigt skeptisk och trodde inte att jag skulle lära mig något då varken matte eller svenska var mina starka egenskaper, speciellt när jag fick 12/40 på första övningsprovet på kursen. Jag blev även väldigt förvånad över hur många som var engagerade och vågade svara trots att

de inte kunde svaret, det gav mig självförtroendet att inte vara rädd för misstag.

Vill du bli jurist från början eller kom idén under HP kursen?

– Jag hade tagit beslutet om att jag ville plugga till jurist redan i årskurs 9 när man skulle välja inriktning inför gymnasiet. I början var det endast för faktumet att det inte skulle vara några operationer eller mattekvationer inblandade. Men med tiden blev intresset för ämnet större, speciellt när man fått lära sig varför vissa lagar finns och hur man ska tänka när man dömer någon för ett brott.

Hur tror du att kursen har bidragit till din utveckling för själva provet?

– På kursen har jag lärt mig en massa olika metoder för att lösa matematiska problem, till exempel hur man snabbt kan använda huvudräkning genom att känna igen ekvationer för att spara tid. Vi fick dessutom formelblad med potenser som Hayrettin sa att vi

skulle memorera. Det kom till väldigt stor nytta under provet. Men det var inte bara matematik han hjälpte oss med, utan svenskan och engelskan också. Man kan inte förutspå vilka typer av frågor som kommer upp på den verbala delen, men han gav oss väldigt bra tips på hur man kan utesluta fel svar och på så sätt hitta rätt. Han var en väldigt bra lärare och uppskattar all tid han lagt på att hjälpa oss.

Hur var vänskapen på kursen?

– På kursen fanns det en så härlig gemenskap. Det var många bekanta ansikten så det gjorde det mindre jobbigt i början. Men det tog inte lång tid innan alla var vänner med varandra.

Hur var din familjens inställning till kursen?

– Mina föräldrar tog kursen på fullaste allvar och vi missade i princip aldrig några lektioner. Min familj tror på att alla kan bli något stort om man verkligen tar initiativet och faktiskt försöker, i stället för att låta ens dåliga förutsättningar begränsa en. Det är något jag är

väldigt tacksam över. De lät mig inte ge upp och jag känner att jag verkligen behövde det.

Rekommenderar du kursen för andra och varför?

– Det gör jag verkligen! Det är väldigt gynnande om man verkligen vill och försöker lära sig. Detta är en kurs som tagit mig från 0.8 till 1.15, om jag kan så kan verkligen vem som helst. Jag hade rekommenderat att man inte litar på alla sina tidigare kunskaper så mycket när man går dit för man lär sig saker på helt nya sätt. Det gör allt så mycket roligare när man faktiskt förstår vad man håller på med.

Hur kändes det när du visste att du kom i din drömutbildning?

– Det var verkligen en lättnad. All min tid jag spenderade på att plugga till högskoleprovet hade kommit till nytta. Jag var i lite av ett chocktillstånd i början och det tog mig några dagar tills jag faktiskt förstod att jag äntligen skulle få plugga det jag drömt om så länge.

Hur var reaktioner från din familj och din omgivning?

– Alla var så glada för min skull. Vi var på semester i vår by i Turkiet när jag fick beskedet. Jag berättade endast för min familj, men på slutet av dagen hade nästan hela byn fått höra om beskedet. Det gör mig väldigt glad att tänka tillbaka på hur stolta mina föräldrar var när de fick höra de goda nyheterna.

Hur går det i skolan nu?

– Det går bra men det är väldigt högt tempo då det är första terminen. Det är mycket information man ska lära sig på fyra år och det är mycket eget ansvar och många timmar man spenderar på att plugga. Men jag är exakt vart jag ska vara och håller på med exakt det jag velat, så är tacksam att jag ens fått denna möjlighet. Ser fram emot att få lära mig allt och ta examen med färdigheter jag inte hade när jag först satte fot på universitet.

Vad vill du göra i framtiden när du är klar som jurist?

– Jag vet inte än, men det är just det som är det fina med juristprogrammet. Ämnet är så brett så jag har en massa olika alternativ att välja mellan. Ena dagen vill jag bli skattejurist, och andra dagen diplomat eller utskott i riksdagen. Listan med möjligheter är nästan oändlig. Så vad jag väljer att bli återstår att se.

Vad saknar du från kursen nu?

– Jag saknar rutinerna jag hade under tiden jag gick på kursen. På vardagar satt jag i biblioteket och pluggade, och på lördagarna gick jag till kursen för att få hjälp med frågor jag haft svårt med. Jag saknar att plugga inför provet med mina vänner från kursen. Det var många släktingar som brukade komma till lokalen på lördagarna för att lära sig kurdiska och jag saknar att träffa dem så ofta som jag gjorde då.

Peykerê bi serê xwe

Çîroka peykerekê li Kurdistanê

Li evarek/î

Li şeveke payîza pelzer xewnek bû

Li min mêvanbû.

Dayikek her destê evaran

Şara serê xwe ji deşta malvêraniyê verdigirt

Çote stêrk ji çote çavên wê dibarî

Ava çemên Mûradê weke tofana hebûnê

Girî dibarand li ser gora pêlekî

Nav dilê lawekekî reng qemerî

Li serheda jorê, nik dêrsima jêr radibim!

Li nevalekê cote kew firdidin berbi mirina gerstêrkekê ve

Yek dimre

Çuyînek ji kerwanê hebûnê dereng dimîne

Di kîsikê dayikekê de zaroyek dilive

Yek digrî

Du çav kordibin li çolekê

Eşq

Peykerê xwe hildiweşîne

Yanî ez

Ew etîmê li ser milê xaçperesta

Yê li kozikê kalekê

Li çiyayekê

li şerekê de sond dixwim

ji hût û tebayên çîroka re pesnê siwarê hedmanan didim

çar wextan çar keriyê xakê re nimêja azadiyê dikim.

Ez ew peykerê ku bextewar

li çiyayan tim bendewar

Sîya Jandar

Keça kurda

Ez keça kurda
Roja hatim dinê
Gotin keç e şerm e
Ez bi lez pêçandim li pêçekê
Hemûn tiştên li dinê xweşik û xweş
Li min xedexe kirin
Û ez veşartim ji jîn û jiyane
Dan min nav û paşnavên zimanê xelkê
Di guhên min de ezan xwendin
Gotin tu namûs e
Divê tu xwe baş bizanibe
Hatim lorandin bi çîrokên tirsê
Hebûna min li min qedexe kirin
Veşartin ji min dîrok û çanda min
Nasnamak kirin tûrikê min
Gotin ev tu yî
Lê ez di wê nasnameyê de qet tune bûm
Û ez jî mîna welatê xwe windayî bûm

Suphiye Bulut

Dengê bêdewletîya min - 1

Xoyretînê Mihemmedî Seîd

Bêdewlet im.

Mûsa me li ber derîyê Misirê. Îsa me li ser çarmixê li Orşelîmê, li gûndêkî deşta Kenanê. Mihemmed im li Taîfê. Lê ne Mûsa, ne Îsa û ne jî Mihemmed wek min bêkes bûn.

Mûsa li çîyayê Tûrê, Îsa li ser çarmixê û Mihemmed di bin kevr û kuçên Taîfê ne wek min bêkes bûn.

Xûdê (Yezdan) ji Mûsa re got; bi dev ku birayê wî Harun jî kirîbû pexêmbere wek wî bo alîkarî, ji Îsa re got; netirse kûrê Meryemê, em ê te bigrin û rakin cêm xwe û ji Mihemmed re got; were dost em ê te li gerdûnan bigerin û şûna Taîfê. Ez ê dilê te yê zîz şa bikim. Dilê min ê zîz bêdewlet bû û qet şa ne bû.

Bêdewlet im wek kurikêkî bêbav. Wek bavêk ku pî û bask li şikestî. Bêbavtiya min ji bêbavtiya kurê Meryemê, Îsayê nemir neçetir nebû. Usivê pexêmbere im, kurd im di bin zîndanên de. Wek Yaqûb li rêya Usivê xwe bawê min jî kor bû bi girîye şev û roj.

Dibêjin dogeh ji heft qatan hatîye çekirin. Lê ez wek kurd li qatê heyştan dijim. Qatê ku Mihemmed jî nedîtîye. Qatê ku Virgîliusê Dante jî bîrkirî bû û qet li negerîya. Qatê ku 3000 sal in çîyê çihûyan bû, niha tenê em kurd tê da man.

Bêdewlet im, kes nizanê halê min. Li çîya û banîyan tên kuştin keç û xortên me.

Ne îngîlîz im ku li Royal Albert Hallê gûh bidim koma *the Beatles* wexta ku strana “Yesterday” distirin.

Ne îtalî me ku li peykêrên Leonardo Da Vinci temaşakim li Florensa ku wek gerdana cîhanê dibiriqê.

Ne almanî me ku kitêbên Goethe bixwînim li Frankfurtê ji dil da bi almanîyeka paqij.

Kurd im, bê dewlet im. Ehmedê Xanîyê me, Milleyê Cizirî me, Siltan Selahaddînê me Şêx Seîdê Kurdîyê me û Şivan Perwerê me bêkes in.

Bêdewlet im. Kilam, stran û çanda me tê talan kirin.

Jenosîdeke spî li ser me tê gerandin. Kurd im, bê dewlet im. Zar û zeçên me ya li zîndanên xêrnexwazan yan jî li kolanên Ewropayê tên kuştin.

Kurd im, bê dewlet im. Dengbêjek digere li ser dilê min. Şakiro distire strana bê dewletî ya min.

Kurd im, bê dewlet im. Li Mandelayekî, li Gandhîyekî, li William Wallacekî digerim.

Kurd im, bêdewlet im, lê ne bê hêvî me. Kurd im ji zaliman, ji neyaran natirsim.

Rojêk ji rojên Xûdê Teala welatêkî me jî yê hebe.



Kitêbeka nû ya helbestan a Xizan Şîlan **Hestên piştîxûz**

Xizan, li gundê Încovê/Cihanbeyli "Anatoliya Navîn" ji dayik dibe. Dibistana destpêkê li Încovê xilas dike û bi malbata xwe ve bar dikin Konyayê, li wir dibistana navîn û lîsê diqedîne.

Di salên 1970î de bi tevgera azadiya kurd re têkiliya xwe çêdike. Di wê demê de gelek caran rastî zilma dewletê tê û tê girtin, êşkence dibîne û pişt re mecbûr dimê ku derkeve derveyî welêt. Şêş salan li Almanyayê dimîne û dîsa vedigere welêt.

Piştî cunta 1980î careke din mecbûr dimîne ku derkeve derveyî welêt. Îcar tê Swêdê, li bajarê Stockholmê bicih dibe. Xizan, niha li bajarê xerîbiyê, li Stockholmê jiyana xwe bi malbata xwe ve li nav salên temenê wêran, kul û keseran û di hesretkêşiyê de berdewam dike.

Xizan yek ji hevkarê kovara Bîrnebûnê ye. Helbestên Xizan hema hema di her hejmarên kovarê de hatine weşandin.




Berhemên Xizan ên heta niha hatine çapkirin:

- 1-*Xem û xeyal*, helbest
- 2-*Acuların sokağı*, hikaye
- 3-*Nameyek ji rinda min re*, helbest
- 4-*Pêjnên laşê mirî*, helbest
- 5-*Axîna sîngê qeliş*, helbest
- 6-*Pêlên bayê felekê*, helbest
- 7-*Paşila şevan*, helbest
- 8-*Albûma jiyanê*, helbest
- 9-*Hestên piştîxûz*, helbest



DONATIONER
— VARA MED OCH BIDRA TILL BARNENS FRAMTID —
ALÎKARÎ
— TEVLÎ PÊŞEROJA ZAROKAN BIBIN —



TÊKILÎ / KONTAKTA OSS
Mjölmarstigen 1, 163 41 Spånga,
Stockholm, Sweden
E-mail: info@stiftelsenkan.com

Hevkarên me / Våra samarbetsparner



Folkuniversitetet

Folkuniversitetet Gävleborg
Drottninggatan 10, 803 20 Gävle



BOTKYRKA-SALEM
ABF Botkyrka-Salem